




Dem û zindan

Arîstoteles ji bo demê dibêje encama tevgerê ye. Yanî tevger hebe dem jî heye. Her tevger bûy-erek e. Pîvana demê bi tevgerê diyar dibe. Li gorî Arîstoteles, tevger di tiştên temam-nebûyî de pêkan e... **Helim Barin / R.8**



Odeya Arthur Rimbaudî

Diyar e êş û elema Parîsê û derd û kula Verlaine lê zor hatiye û xwe yekcar daye absentê. Rim-baud bi qasî meh û nîv li vê hotela biçûk dimîne. Di wê navberê de dost û hogirên wî jî tên serdanê... **Bilal Ata Aktaş / R.8**



Hejmara nû ya Zrîngê derket

Hejmara 8'an a kovara Zringê ya karîkatur û qerf û henekan bi hejmareke nû gihîşt ber destê xwînerên xwe. Kovarê di berga xwe de bi boneya 25'ê Mijdarê bal kişandiye ser tekoşîna jinan a li hemberî tundiyê... **R.11**

xwebûn

2-8 MIJDAR 2020 HEJMAR: 46 BUHA: 4 TL rojname@xwebun.org

Dejenerasyon û zimankujî

Bi axaftina bi zimanekî din dejenerasyon e! Li çar aliyê welêt, çi mezin çi jî biçûk hema bêje li hemû bajaran axaftina bi tirkî normalîze bûye. Tiştê ji vê jî ecêbtir ev e, di civakê de li hemberî vê zimankujiya ewqas zelal heta niha tu reaksiyonek cidî derneketiye holê. Yek ji sedemên vê yekê, hilweşandina peyva "dejenerasyonê" ye... **Necat Ayaz / R.5**

Divê mirov ji kaniya kelepora xwe vexwe


Çend roj berê berhema lêkolîner Mehmet Oncu ya bi navê 'Gotinên Pêşîyan' ku ji 4 cildan pêk tê ji weşanxaneya Sîtavê derket. Mehmet Oncu ji rojnameya me re axivî û wiha got: "Ji ber ku zimanê mirov parçeyek ji nasnameya mirov e, çand û kelepora ku mirov di nav wê de mezin dibe jî di pêkhatina nasnameya mirov de xwedî roleke mezin e. Divê mirov ji kaniya kelepora ku mirov jê tê têtetêr vexwe. Sûdê ji wê werbigire û berhemên xwe jî ne dûrî wê biafirîne. Heke berhemek bîna kelepora xwe rane-hêle bêkok dibe..."

Hevpeyvîna Rizoyê Xerzî / R.4



Minet ji neyaran nabe

Li Kurdistanê jî pêvajoyeke dijwar û metirsîdar a pergala dagirker û mêtînger tê ferzkirin. Li dijî vê mix-abin kurdan ne karîniyekî tîkêl çêkin, ne jî êrîşên dagirkeriyê bidin rawestandî. Ango metirsiya li ser destkeftiyên kurdan veguherî metirsiya li ser hebûna wan jî! Çimkî êdî bi awayekî bêarî zimandirîjîyê li hebûna kurdan tê kirin. Nîrx, pîrozî û destkefiyê wan a dest navêtinê nehiştin. Her roj bi rûmet û karameta gelê kurd tê lîstin! Destavêtin, girtin, zext, kuştin, talan hwd. tiştên nekirine nemane. Mixabin vê kambaxî û malwêraniyê, kurd bi xwe tînin serê xwe. Gelo bi rastî jî dagirker ewqas bi hêz, zana û aqilmend in? Na! Çavkaniya sereke ya vê parçebûnê bêtifaqî ye... **Mem Avba / R.6**



Roja Kobanê ya Cîhanî: Roja azadiyê

Felemez Ulug / R.7

Şerma herî mezin

Ev demek e li parçeyên Kurdistanê yekitiya neteweyî di rojêva kurdan de ye. Li Rojava hewldan didomin, li Bakur jî bo hilbijartina tifaqa kurdistanî careke din hat ragihandin. Serokê PDK-T'ê Mehmet Emîn Kardaş ji rojnameya me re axivî û got ku ger di vê sedsalê de kurd yekitiya xwe pêk neynin ev şermeke mezin e û niha dema yekitiyê ye... **R.6**

HEWILDANÊN TALÛKE

Rêveberiya Başûr li gorî berjewendiyên Tirkîyeyê tevdigere

Nûçe / R.6



Li Îzmîrê erdhej çêbû

Li navçeya Seferîhîsar a girêdayî navenda Îzmîrê, 30'ê cotmehê, saet 14,51'an, bi pileya 6.6 erdhejê dijwar çêbû. Li gelek bajarên herêmên Ege û Marmariyê, erdhej hat hîskirin. Gelek avahî hilweşîyan û herî kêr 12 kes mirin û bi sedan kes jî birîndar bûn... **R.3**

Kuştin an xwekuştin?

Kuştinên berê pir nedihatîn bihîstin. Çi bi serê wan bi-hata newêribûn zêde deng ji xwe bikin û heta wan li xwe heq jî didît. Gelekan êşa xwe dadîqurtandin. Piştê wan tune bû. Ew ji lome û bêbextîyan di-tirsiyan. Dinya biçûk bûye, zû tê bihîstin. Nema di bin cilikê de dimîne lê mejiyê mirovan hîn jî biçûk e. Mêr mêran neheq nakin lê jinek-dayîkek jî zû bi zû mêran neheq nake. Dibêjin zeman xera bûye û êdî kes bi ya hev nake lê ew tenê bi hêlekê digirin, hêla mêr digirin û gîşî diavêjin stûyê jinê...

Xecê Bîşeng / R.2

Embaziya luye û şêrî

Luye û şêrî benê embazê jubînî. Benê embazê jubînî... Luye vana "birawo şêr çend serrîyo ma embazê jubînîme to pîzê mî mird nêkerd." Şêr gêreno ra luye rê vano "Waka luye to ayb kerd, bê ma şîme ez pîzê to mird kerî." Nîyetê luye owo ke hem pîzê xo mird bikera, hem zî sey şêrî nêçîrî bimusa. Aye bimiso... Danê raye şonê jû merge. Şonê jû merge... Ma vacîm mergê de zê Merga Gola Devan. Qayt kenê merge de davistê astor hawo çeren. Amnanan wayîran astorî verdayî ra merge. Merge de çerenê. Bîyê mird û gird. Xurtê yanê...

Turabî Kîşîn / R.9

Pergala êl û eşîriyê

Li cem amazîghan mervatî ango xizmatî girîng e û ev taybetmendiyeke wan a kevn e. Ji berê de xwedî êl û eşîr in û ew van êl û eşîrên xwe bi awayekî demokratîk bi saya rûspiyan bi rê ve dibin. Loma jî nêrîna netewe-dewletbûnê napejirînin û vê pergale dîrî xwe dibînin. Ew di vê baweriyê de ne ku nasnameya civakan bi saya bawerî, dîrok û zimanên hevpar dikarin xurttir bibin. Bi van sedeman ve girêdayî, tê zanîn ku li axa Mexrîbê pergala qebîletiyê zêde li pêş e û di hundirê xwe de nêzî pergala sosyalîzmê ye... Dosyaya **Arîn Dîren / R.12**

Jinkuştin, xwekuştin, çima?

Xecê Bîşeng

Çima jin xwe dikujin û çima tîn kuştin. Gelo hema ez wiha dest pê bikim dibe? Ez hevokeka çawa saz bikim? Ma rehet e mirov qala kuştinê bike û nerm be, hêmin be, ne qebe be! Ne bi şîd be û kerika guhên mirovan neêşîne. Gelo ez li hevokên ku tu kesan aciz neke bigerim û mijarê wiha vebêjim dê ne baştir be? Ma hema xema min dê timî şenûnî û nişmîbûna gotinê be qey!

Li ser vê mijarê serê me gişan tevlihev e. Niha hûn jî li ser wê diponijîn: “jinkuştin”, “xwekuştin” û çima?

Erê serê me ji çimayan dike zingînî. Êdî bûyerên xwekuştinê bê hejmar in, xwe li kerika guhên me dixin. Kuştin zêde dibin, xwekuştin zêde dibin, guman zêde dibin.

Yek li wir hat kuştin û yek li vir hatkuştin, wê xwe kuşt û ew kuştin. Kuştin, kuştin û cardin kuştin. Em di rojekê de nûçeyên çend bûyerên kuştina jinan dibihîzin? Ên ku em dibihîzin rojê du-sê jin ji aliyê hevjinên xwe ve tîn kuştin, an jî ji aliyê dergistî-heskiriyê xwe ve. Li her bajarên Kurdistanê, Tîrkiyeyê bê rojê çend bûyerên kuştina jinan diqewimin, bê hesab in. Ên xwe dikujin, dadilqînin, dişewitînin, difetîşînin, dixeniqînin û yên guleyekê bera xwe didin...

Li Stenbolê di saetekê de du jin tîn kuştin. Li Amedê nûçeyên sê jinên kuştî bi hev re tîn dayîn. Her roj em nûçeyên kuştina jinan dibihîzin. Jixwe li başûrê Kurdistanê modaya kuştinê, xweşewitîn e! Geh bi komî û geh yek bi yek.

Vî çendî li Qoserê jinek din hat kuştin “xwe kuşt”. Fedîle Asan nema karibû tadayiya lê dibe rabigire, xwe kuşt. Ma kesî bihîst? Ajanseke Qoserê behsê kir û hew. Min jî ji wir bihîst. Dewseke bi êş hişt. Ew ne ya dawî bû. Berî wê jî û piştî wê jî hatibûn kuştin û hîn jî tîn kuştin. Dinya jî xera bibe ne di bala kesî de ye. Dibêjin “ê elimî ji yê cehimî xerabtr e.” wekî ku mêşek hatibe kuştin.

....Guldunya, Dîlan Dogan, Emîne Bûlût, Leyla Tanirgan (ji hêla apê xwe ve hatin kuştin), Pinar Gültekin, İrina Slavina(rojnameger-Rûsya)wê xwe kuşt), Ayfer Serçe (rojnameger-ji bo lêkolîna xwekuştinên jinan diçe Îranê, li wir tê kuştin), Adule Kardaş (50 salî, mirî hat dîtin, Baglar-Amed), Zehra Eken (mirina bi guman-Farqîn) Elîf Aydın (ji hêla hevjinê xwe ve hat kuştin-Bûrsa), Duygu Çelik (mezelê wê li daristanekê hat dîtin-Antalya)... lîsteyeke dîrêj e navên jinên kuştî, ha wê xwe kuşt û ha hinekan(!)

Kuştin, xwekuştin û dewlet

Duh jî jin hatin kuştin û îro jî jin tîn kuştin. Ma ferqa jinên ku xwe dikujin û yên ku hinek wan dikujin ji ya yên dewlet wan dikuje çi ye?

Duh: Her kuştin bi guman bû û dihat veşartin. Tenê malîyên wan dizanîn an jî bi pistepistekê der û ciran pêdihesiyan. mirov dibêje qey hemû însan ji bo deng jê derneyên, li hev kiribûn. wekî tiştek nebûbe, herkes bêdeng bûn. Yên zanibûn jî ji bo xwe biparêzin behs nedikirin. Mezinên malbatê biryara kuştina wan didan û ser bûyerê dinixumandin.

Keçên ji aliyê bavên xwe ve hatin kuştin, ên bi zorê bi birayên wan ê biçûk dan kuştin, ên bi fermana dê û bav bi hinekan dan kuştin, ên bi biryara eşîr û malbatê bi destê zarokan dan kuştin, ên hatin ricimandin û yên ku bi lîxistin û tada mêrê xwe hew karî li ber xwe bidin ji kerban mir in. Kevirê reş datanîn ser û deng jê nedianîn. Yê



kir jê re ma, jê re dima.

Kuştinên berê pîrr nedihatîn bihîstin. Ku çî bi serê wan bihatana newêribûn zêde deng ji xwe bînin. Û heta wan li xwe heq jî didît. Geleka êşa xwe dadiqurtandin. Piştî wan tune bû. Ew ji lome û bêbextiyan ditirsîyan. Her kesî bi dawa mezinan digirt. Ma yê wan çî ji destê wan dihat.

Îro : A niha jî biserife nahêlin kist ji bûyerê derê. Dinya biçûk bûye, zû tê bihîstin. Nema di bin cilikê de dimîne. Lê mêjiyê mirovan hîn jî biçûk e. Mêr mêran neheq nakin lê jinek-dayikek jî zû bi zû mêran neheq nake. Dibêjin zeman xerabûye û êdî kes biya hev nake. Lê ew tenê bi hêlekê digirin, hêla mêr digirin û hemû dixin stûyê jinê. Wexta dibên nema kes bi xebera kesî dike ya ku qest dikin jin e. Li gorî wan jina bi peyva mêrê xwe nekiriye, çî bê serê wê heq e. Dibêjin, “Çi xweş bû, ji ber bêheyayî û netebitîbûna wan e.” Ev aqil weke bizmar di serê xelkê de kutane, çî jin be çî mêr be! Bi vî aqilî radibin. Beşek însanan heq an jî neheq bibînin jî wek ku nebihîzin dikin, dibêjin “Çi ji min o, ne ji ber agirê min o.”

Jixwe ya herî baş a vê demê ev e ku bûyerên kuştinên jinan tîn belgekirin. Tevî hemû hewldanên windakirina delîlan û ji aliyê sawciyan qedexekirina qalkirina bûyeran jî, dîsa li ciyekî tîn nivîsandin û behskirin. Ên li dij derdikevin jî zêde bûne. Ên pê aciz dibin û jê nerazî ne jin û mêr hene û bi hev re ne. Mixabin, li dijderketinên li hember van kuştinan bûye wek berfa tu biavêjî nava avê dihele. Li her derê kuştin zêde dibin, kêmanabin. Kujerên vê demê bi cesaret in, bi dizî nakin û ne li benda tu biryaran e, hema dikujin. Dewlet li piştî wan in. Dinya li piştî wan e. Meydan meydana wan e.

Jinên nivîskar

Sylvia Plathta nivîskar û helbestvan, serê xwe xistibû fîrna dadayî û xwe fetisandibû. Çiqas sedem wek rewşa wê ya derûniyê bê nîşandan jî miheqeq serse-

bebeke wê heye. Virginia Woolfê got ez nema karîm hew şer bikim, bêrîkên xwe tije kevir kirin û xwe avêt çem. Ma çî nehatibû serê wê ku xwe nefetîsîne. Jina têkoşer a endama LGBT’yê Sarah Hegazî’yê jî bangî dinyayê kiribû û jê re gotibû, “Dinya! Tu bi serketî, hema min tu efû kiriye.” Ez nizanim Sebahata Qoserî çî gotiye? Lê têkoşerek ku bêdeng xwe bixeniqîne, lazîm e mirov li ser bifikire.

Jinên têkoşer û şoreşger

Bi salan e jinên şoreşger ji aliyên dewletan, desthilatdaran ve tîn kuştin. Sisê sisê dibin hedef. Sisê, sisê û sisê... Çiqas awayên kuştinê û cihên wê cuda bin lê yên tîn kuştin şoreşger in, têkoşer in û jin in. Yên wan dikujin mêr in, hikûmet in, dewlet in, serdest in. Dixwazin bi van komkujîyan, qira jinan bînin.

Hypatîa li Îskenderiyê, li wî perrê dinyayê. Rosa Luxembûrg li perrekî din ê dinyayê, li Almanyayê û Ekîn Wan a gerîla li vî perrî, di kezeba Gumguma Mûşê de rastî heman hovîtî û dirindeyiya bê eman bûn. Her sê jî bi lîxistinê can û cesedê wan perçe kirin û ew tazî avêtin rastê, pêş çavê xelkê. Salên dûr û dirêj di navbera kuştina wan her sêyan de hebûn. Hema di tevgera kujeranan de û awayên kuştina wan de tu guherîn çênebûne. Heman feraset e. Heman hovîtî ye.

Li Tirujîlloya Domînikê sê xwişkên Mîrabal li çolekê, rê li wan girtin, destdirêjî wan kirin û kuştin. Li Parîsê her sê jinên dîplomat ên kurd, Sakîne, Leyla û Fîdan, di buraya enformasyonê ya Kurdistanê de li ser hev kuştin. Li Sîlopyayê Pakîze, Sêvê û Fatma, tevî ku dizanîn sîvil in, di partî û rêxistinên sîvil de dixebitin, bi birîndarî gule li wan reşandin û ew kuştin û her sê jinên li Kobaniyê Zehra, Hebûn û Emîne bi bombardûmanê qetil kirin. Ma çî cudahî di nava wan kuştinan de heye? Ji bo kuştina van jinan nîşan girtibûn û ew kuştibûn. Ne ferq di nava karê van jinan de heye û ne ferq di nava qetilkirina wan de heye.

Li Efrîna dagirkirî jî her roj jin tîn revandin, destdirêjî wan dikin û dikujin. Tazî diavêjin çolê, li Şengalê jî eynî tişt kiribûn. Li Îranê û rojhilatê Kurdistanê, jinek li gor dilê xwe tevbigere, tê darvekirin. Li gor şerîetê komkujîyan dikin û qetla jinan hemûyan helal e. Hemû دنیا wek ku ji wan re li çepikan bixin, bêdeng in.

Hevrîn Xelef di encama suîkastekê de hat kuştin, rayedarên dewleta tirk got me masiyeke mezin girt. Dîlek Dogan, berî wê bi çend salan di mala xwe de bi derba polîsan hatibû kuştin, çawa derî vekiribû bera eniya wê dabûn. Kujeranan gotin tîkiliya wê bi terorîstan re hebû. Li gor wan ew jî masiyeke mezin bû. Pippa Bacca ya bi projaye “bûka aştîyê”ji bo aştîyê ketibû rê dirûşma wê ev bû: “Ez bi mirovan bawer im. Ez ê xwe lê biqewimînim, ez herim her cihên ku şer lê hene û ez ê bîna aştîyê bibim wir.” Pippa Bacca ya aştîxwaz ji ket tora mêran, ew jî weke Ozgecanê, ajokarê erebeyekê tecawizî wê kir û ew kuşt, bi ser de jî parçe parçe kir.

Feray Şahîn, xwendekara Zanîngeha Torosê (Mêrsîn) û di sala 2017’an de ji hêla polîsekî ve hat kuştin. Nadîra Kadîrova ji hêla wekilê AKP’yî ve hat tacîzkirin - kuştin (2019), mêrik leşkerekî kevn bû. Piştî ku malnîşîn bibû, bû wekil. Di sala 2020’an de Dîlek Kaya li Amedê ji hêla dergistiyê xwe yê astsûbay bi guleyekê hat kuştin. Îpek Er, çawişê pîspor Mûsa Orhan dest avêtê, wê xwe kuşt. (2020). Gulistan Doku winda ye (2020). Mêrê ku guman jê tê kirin ku tiştek bi Gulistan kiriye jî zirlawê polîsekî li Dêrsimê ye. Ev bûyeran di nav du salan de qewimîne û hema min seresere got. Wexta mirov li îstatîstîkan binêre hejmar sê qat e. Geh dikujin û geh ber bi xwekuştinê ve daf didin û kujer tim tîn parastin.

Dîsa ez hatim ser hevoka serî: ma jin xwe dikujin an jî tîn kuştin? Ger ku em hemû bûyeran veçîrînin û li sebebên esasî bikolin, em ê bibînin ku tu jin



belasebe xwe nakuje. Jixwe dewlet, mêr û hişê nêr, tev de jinên kuştî, jinên mirî, bê fikr û bê tevger dixwazin. Kuştina jinan ne bi nezanî û cahilî ye, bi zanîn û qestî tîn kirin. Ne jixweber e. Ne qeza ye û ne meseleyeka malbatî ye. Ne ya gundekî, bajarekî, welatekî ye jî. Li kîjan aliyê cîhanê jinên ku piçekî li ber xwe dabîn, pêşiya wan hatiye girtin, weke hovan tîr îşkencekirin û dawîya dawî tîn kuştin. Yên bi destdirêjî û destavêtinan re rû bi rû mane, ji qehran xwe kuştine. Ji ber tadeyiya malbatê û mêrên xwe debar nekirine, xwe kuştine.

Li ku be, bi çî awayî be, ez ji hemû kuştinan re kuştin dibêjim. Ên xwe dikujin û tîn kuştin sebeba wan yek e: “Ew tîn kuştin.”

‘Qoser Ajans: Hesabekî medya civakî ye:https://instagram.com/qoserajans?igshid=10iio0wdrvdd

‘Li gundekî jinek mir, her kesî bi guman li mirina wê dinêrî, axir malbatê bi dengê hew ew bibihîzin, di ber xwe de wiha gotin, “Hew wexta rih jê çû, ço ne li ser serê wê bû.” Pîrr jin ji hêla bav û bira yan ferdekî ji malbatê hatine kuştin birine li ciyekî dûr kuştine-dane kuştin, lê bi awayekî li ciyekî tê bihîstin.

‘Fatma Altınmakas, tiyê wê destdirêjî wê kiribû û ji aliyê mêrê xwe ve hat kuştin, sawcî qedexe danî ser qalkirina bûyerê.

‘Virginia Woolf, du zirbiryayênwê bi salan destdirêjî lê kiribûn. Jixwe hîn zarok bû diya wê miribû, vê kiribû ku derûniya wê tarûmar bibe. Çiqas li ber xwe dabû, xwe baş jî kiribû lê dîsa zora xwe nebîr û xwe kuşt. Di nameya xwe ya berî mirinê de gotibû, “Hew karîm, ez êdî nema şer dikim.”

‘Sarah Hegazî, piştî têkoşîneka dûdirêj xwe kuşt û li pey xwe nameyek hişt, “Ji bo xweh û birên min: Min hewl da bijîm, lê ez bi ser neketim, min efû bikin. Ji bo hevalên min: Ev rêwîti pîrr bêwîjdan e, li hember wê ez pîrr lawaz ketim, min efû kin. Ji dinyayê re: Tu pîrr bêwîjdan bû, hema min tu efû kir.”

‘Sabahat Oral, jinek Qoserî bû. Bi salan di nava têkoşîn û tevgerên jinan de bû, wê jî bi destmala xwe xwe xeniqand.

‘‘Li mêtîngehan mirov namirin, tîn “kuştin.” https://xwebun.org/tiliyen-kemal-kurkuti/

Li Efrînê 18 sivîl hatin revandin

Komên paramîlîter "Semergend û "Ceyş El-Şerqiya" yên di bin kontrola Tirkîyeyê de li navçeya Cindirê ya Efrînê bi ser malan de girtin û ji gundên Kefersefra û Goranê 18 sivîl revandin. Di nav kesên hatin revandin de jin û kesên temenên wan mezin jî hene. Komên paramîlîter revandina sivîlên Efrînê ji xwe re kirine karekî rûtîn û bi vê rêbazê mirovan dişêlînin û wan bi pereyan ber didin. ***EFRÎN***

Li Wanê koçberên qaçax hatin girtin

Li navçeya Erdîşê ya Wanê, di TIR’êke biguman de jin û zarok jî di nav de, 210 koçberên qaçax ji hêla leşker û polîsan ve hatin desteserkirin. Di nav koçberan de 170 afgan, 26 pakistani, 9 iraqî, 4 bangladeşî û 2 jî Ozbekî hene. Bi koçberan re ajokarê TIR’ê jî hat desteserkirin. Hem koçberên qaçax hem jî ajokar radeştî Rêveberiya Koçberan a Walîtiya Wanê hatin kirin. ***WAN***

Demîrbaş bi koronayê ket


Şaredarê berê yê navçeya Sûrê ya Amedê Abdûllah Demîrbaş ku ji ber dozên xwe yên siyasî penaberî welatê Swîsreyê bûbû, bi vîrusa koronayê ket. Hat ragihandin ku Demîrbaş li beşa hûnêrnînê ya nexweşxaneyê tê razandin û rewşa tenduristiya wî ne baş e. Demîrbaş dema şaredariya xwe tabeleya pîrzimanî li Sûrê daliqandibû û ji ber vê hewldana wî doz lê hatibû vekirin. ***BERN***

Mele Abdûllah çû ber dilovaniya xwe

Endamê Tevgera Civaka Îslamî Mele Abdûllah Aksoy ku weke Mele Evdirrehmanê Xendekî dihat nasîn li Êlihê jiyana xwe ji dest da. Cenazeyê Aksoy li navçeya Cizîrê ya Şîrnexê hat veşartin. Aksoy, lêkolîner û dîroknas bû û di vê derbarê de nêzî 20 berhem pêşkêşî civaka kurd kirin. Gelek rêxistin û partiyên kurdan ji bo Aksoy xemgîniya xwe anîn ziman û sersaxî ji malbata wî re xwestin. ***ÊLIH***

Yilmaz jiyana xwe ji dest da

Serokwezîrê berê yê Tirkîyeyê Mesut Yilmaz mir. Yilmaz, demk bû ji ber di piş û mejiyê wî de tumor hatibû dîtin, dihat tedawîkirin. Yilmaz, gelek caran weke parlamenter hatibû hilbijartin û di gelek hikûmetan de wezîrtî kiribû. Herî dawî jî bûbû serokwezîr û ji bo pîrsgirêka kurd gotibû, rêya YE'yê di Amedê re derbas dibe. ***STENBOL***



Li Îzmîrê erdhej çêbû; gelek kes mirin

Li Îzmîr û Çewligê erdhej çêbûn û di erdheja Îzmîrê de gelek avahî hilweşiyan. Li gor agahiyan, ji ber erdheja li Îzmîrê, herî kêm 12 kes mirin û ji 500'î zêdetir jî birîndar bûn. Li navçeya Seferîhîsar a navenda Îzmîrê, 30'yê cotmehê, saet 14,51'an, bi pileya 6.6 erdhej çêbû. Li gelek bajarên herêmên Ege û Marmariyê, erdhej hat hîskirin. Hat

ragihandin ku erdhej 30 saniye domiya û li navçeyên Buca û Bayraklıyê hin avahî hilweşiyan. Gelek kes di bin kavîlan de man û AFAD'ê ji bo rizgarkirina welatiyan dest bi xebatan kir. Heman rojê di saet 11.48'an de li navenda Çewligê jî erdhej çêbû. Ji ber erdhejê zirarek çênebû. ***ÎZMÎR/ÇEWLIG***

Sal derbas bûn çapemenî bêdeng nebû

Di salvegera 29'ê cotmeha damezirandina komara tirk de, sazîyên çapemeniyê yên bi kurdî weşanê dikin jî di nav de bi dehan sazî hatin girtin. Bêguman ev ji bo kurdan peyameke zelal bû

Piştî hewldana derbeya 15'ê Tîrmeha 2016'an, Tirkîye bi rêya Biryarnameyên di Hukmê Qanûnê de (KHK) hat birêvebirin. Di vê çarçoveyê de di 29'ê cotmeha 2016'an de rojnameya Azadiya Welat û Ozgur Gundem jî di nav de 15 dezgehên weşanê yên çapemeniyê hatin girtin. Bi vê yekê her çiqas hat xwestin, xofek di dilê kedkarên çapemeniyê de bê avakirin jî lê dîsa jî kedkarên çapemeniyê gav paş de neavêtin. Dezgehên çapemeniyê yên 4 sal berê hatin gitin, bi navên cuda xebatên xwe didomînin. Gelo ev dezgehên çapemeniyê ji bo çapemeniya azad çî îfade dikin?

Bû dengê hemû jinan

JINHA wekî ajansa jinê ya yekem a Kurdistanê di 8'ê adara 2012'an de hat vekirin. Bi vekirina JINHA'yê xeyalên Ayfer Serçe (Şîlan Aras) pêk hat. JINHA 4 salan ji bo çapemeniya azad bû hilmek; bi zimanê ku bi kar dianî lugateke nû xist nav çapemeniyê; JINHA bû dengê hemû jinan. Bêyî ku bibêjin 'ka mêr dê çi bibêjin' dinivîsin û têkoşîna wan her tim ji nû ve dest pê kir.

DÎHA'yê her rastî ragihand

Ajansa Nûçeyan a Dîcleyê (DÎHA) di 4'ê Nîsana 2003'yan de bi dirûşma "Em dev ji şopandina rastiyan bernadin" dest bi weşanê kir. Ajansê 14 salan tiştên ku li Kurdistanê diqewimîn û medyaya girêdayî hikûmetan nedixwestin bibînin bi nûçeyên xwe ragihandin raya giştî. Ji roja hat avakirin bû hedefa desthilatê. Ajansa gelek caran hat astengkirin, bi ser buroya wê de hat girtin, nûçegihanên wê hatin girtin û gefên kuştinê li wan dihatin xwarin. Ajans 48 caran hat astengkirin.



Kevneşopiya li ser koka xwe

Rojnameya Ozgur Gundemê di 30'yê Gulana 1992'yan de dest bi weşanê kir. Rojnameya Ozgur Gundem kevneşopiya rojnameya Yeni Ulke ya di navbera 1990 û 1992'yan de heftane weşan dikir, dewam kir. Di salên 1992-1994 û 2011-2016'an de rojane û bi tirkî weşana xwe kir. Gurbetelî Ersoz bû gerînendeya weşana giştî ya Ozgur Gundemê. Bi vê yekê Ersoz bû yekem gerînendeya weşana giştî ya Tirkîyeyê. Gelek xebatkarên rojnameyê bûn qurbanê failên wan nediyar. Gelek hejmarên wê bi îdiaya "propagandaya rêxistinê" hat komkirin. Gelek caran jî ofîs û buroyên rojnameyê bi êrîşan rû bi rû hat hiştin.

Ev darbeyek bû

Xebatkarên dezgeha çapemeniya azad a di 2016'an de bi KHK'ê hat girtin, têkildarî kevneşopiya çapemeniya azad axivîn. Edîtora servîsa kurdî ya JINHA'yê Munevver Karademîr da zanîn ku sazî li gor geşedanên Tirkî-

yeyê tê girtin û wiha got: "Civaka kurd ji xwe re kirin hedef. Bi vê re êrîşî çapemeniya kurdî kirin. Ev darbeyeke li dijî çapemeniyê bû. Piştî hewildana darbeya ku nebû hikûmetê darbe li dijî civakê kir. Xwestin dengê civakê qut bikin. Desthilat ji bo xwe biparêze êrîş kir. Her kes dizane çapemenî çavên civakê ye. Ji ber vê êrîşî çapemeniyê kirin. Li dijî çapemeniya kurdî êrîşek hebû. Loma ajans û rojname hat girtin. Ajansa jinê ya yekem JINHA hat girtin. Dîsa êrîş li dijî rojnameya Azadiya Welat hat kirin." Munevverê da zanîn ku bi rêya çapemeniyê dix-

wazin dengê gelê kurd qut bikin lê dagirker bi ser neketin û rojnamegerên kurd rêwîtiya xwe didomînin.

Xwestin bêdeng bikin

Midûra karên nivîsê ya DÎHA'ya hat girtin, Dîcle Muftuoğlu anî zîman ku ji meseleyên niha li Tirkîyeyê tèn axaftin yek jê azadiya ramanê ye û wiha got: "Her roj rojnameyek tê girtin û xebatkarên wê tèn binçavkirin. Niha rewş a wekî salên 90'î ye. Hikûmet her kesên ku mixalefetê dike wekî 'terorîst' îlan dike." ***AMED - JINNEWS***

Rojnameya bi kurdî ya yekem

Azadiya Welat di 15'ê Tebaxa 2006'an de dest bi weşena rojane kir. Cara yekem di 1992'yan de wekî heftane bi navê Welat dest bi weşanê kiribû û her wiha Azadiya Welat jî wekî berdewamiya Welat di 21'ê Çileyâ 1996'an de dest bi weşanê kir.

Gelek xebatkarên Azadiya Welat gef li wan hat xwarin, hatin qetilkirin, hatin binçavkirin û girtin. Gelek caran cezayê girtinê xwar. Cezayên giran li xebatkarên rojnameyê hatin birîn. Rojname bi KHK'ê di 29'ê cotmehê de hat girtin.

Li rojnamegeran doz hat vekirin

Zextên li hemberî rojnamegeran didomin. Dozgeriyê ji bo rojnameger Nûrcan Yalçın 15 sal ceza xwest û der barê rojnameger Abdurrahman Gok de îdianame hat amadekirin û di îdianameyê de ji 7 salan heta 20 salan ceza tê xwestin.

Der barê rojnameger Nûrcan Yalçın de, bi hinceta endamtiya Komeleya Jinan a Rosayê, bi daxwaza ji 15 salan heta 20 salan ceza doz hat vekirin. Di îdianameyê de cih ji angaştên şahidê nepenê bi navê veşarî yê ZS355N58UV52PG10 re yên der barê Yalçın de hatiye veqetandin.

Rojnameger Abdurrahman Gok, di 9'ê cotmeha 2018'an de li Amedê hatibû binçavkirin. Dozgeriyê lêpirsîna dabû destpêkirin 2 sal şûnde tamam kir û der barê hevdiîtinên telefon, parvekirinên medyaya civakî û nûçeyên ku Gok çekirine de îdianame amade kir.

Dozgeriyê bi îdiaya "endamtiya rêxistinê" û "propagandaya rêxistinê" îdianame amade kiriye. Dadgeha Cezayê Giran a S'an a Amedê jî îdianame qebûl kir. Danişîna ewil a dozê dê di 23'yê sibata 2021'î de bê lîdarxistin. ***AMED***



DI FOLKLORÊ DE RENG, DENG Û BÎNA GELAN HEYE

Ji kaniya kelepora xwe vexwe

■ Rizoyê Xerzî

Mêvanê me evîndarekî folklor û kelepora zimanê kurdî ye. Hûn navê wî ji gelek berhemên ku di vî warî de hatine çapkirin dizanin. Heta niha gelek berhemên wî yên der barê folklorê de hatine weşandin û herî dawî beriya çend rojan berhema wî ya bi navê Gotinên Pêşîyan ku ji 4 cildan pêk tê ji weşanxaneya Sîtavê derket. Mêvanê me nivîskar û berhevkarê folklor kurdî Mehmet Oncu ye.

Beriya ku em behsa berhema te ya dawî ya Gotinên Pêşîyan bikin, ez dixwazim em vegerin destpêkê. Bi texmîna min destpêk bi helbestê bû û bi pirtûka ‘Ji Kaniya Dil bû’. Ji kerema xwe hinekî behsa wê demê bike. Çi hişt tu ji helbestê berê xwe bidî folklorê?

Serencama min a berhevkirina folklor kurdî kevntir e û digihîje salên 1979’an. Di van salan de ez xortekî hejdeh salî û di pola dawî ya lîseyê de bûm. Wê salê li taxa ku mala me lê, di lêgerînekê de kaxizek li ser min girtin ku tê de 21 heb gotinên pêşîyan hatîbûn nivîsîn. Li ser vê ez 7 rojan di nezaretê de mam, piştî ku îfadeya min girtin ez berdam lê kaxizê min ê gotin lê hatî nivîsîn nedan min. Wê demê min fêhm kir ku ew folklor tomar nebe dê winda bibe. Li ser wê yekê min dest bi tomariya berhemên folklorî kir.

Belê ji salên 1985’an pê ve min hin helbest û çîrokên tirkî nivîsandin. Helbestên min di kovarên wek Adam Sanat û Huriyet Gosterî de hatin weşandin lê min ne domand û ez li nivîsa kurdî vegeriyam.

Ji sala 1986’an pê ve min dest bi tasnîfkirina berhemên folklorî yên ji sahayê kir. Ji wê tomariyê gelek berhemên balkêş derketin. Beşek ji wan cureyên çîrokan bûn ku di nav wan de çîrok, çîvanok, çîrokên biwêjî, gotinên pêşîyan û çîrokên efsaneyî bûn. Beşek gotinên pêşîyan, beşek biwêj, lezbare, tiştanok, stranên dawetan, peyîzok, hevalok (maniyan ku keç şeva hinê li ser hevala xwe ya dikê bibe bûk dibêjin) bûn û her wiha gelek berhemên din. Min di wan berheman de hêza gotin û vegotinê dît. Ji wê bû ku min xwest zimanê folklorê yê herikbar bigihîje wêjeya modern û min dest bi nivîsandina çarînan kir. Ji Kaniya Dil (çarîn), bi nexşên klasîk awazeke modern in û di sala 2016’an de hat weşandin. Paşê min bi zimanê folklorî dest bi nivîsandina romana xwe ya bi navê “Şihîna Hespên Azad” kir. Gava min dît serkeftin heye, min dest bi nivîsandina romana xwe ya bi navê

“Raperîn” kir ku ew jî der barê Baba Îshaq de ye. Ew roman hîn nehatiye çapkirin û ez bawer im heta serê salê dê bê çapkirin.

Di pirtûka te ya “Ji Deftera Kur-dekî” de gelek aforîzma hebûn, ango gotinên ku mirov ji wan aqil digire an jî di wan de hikmet hene. Ew gotin ên te bixwe ne yan jî te ji azmûnên derdorê sûd wergeritiye?

Bêguman ji ber ku ez tomarê folklor kurdan im, berhemên gelêrî li ser xebatên min ên wêjeyî gelek bandor kirine. Ez bi xwe bawer im û dibêjim: “Ez ê herikbariya zimanê dengbêjan ragihînim wêjeya kurdî û di vegotina roman û helbestê de hêza folklor a gel a zindî bixebitînim. Lewma her çi qas ew aforîzma bi tevahî gotinên min bixwe ne jî kana wan folklor a gel e.”

Piştî ewqas xebatên di warê ziman, çand û folklor kurdî de, tu kêmaniyan di wê berhemê de dibîni yan jî bi gotineke din te niha ew aforîzma binivîsiya dê ji wê cudatir bûya?

Naxêr. Jixwe dema min ew aforîzma yek û yek li ser vîtkan (kaxizên biçûk) dinivîsandin, ew gotin û biwêjên folklorî dîsa di destê min de hebûn û min sûd ji wan werdigirt. Bêguman kêmaniyên zimanê ku em di wêjeyê de bi kar tînin hene. Lew ku em îro jî têretêr zimanê kurdî nas nakin û me nekariye xwe bigihînin sînorên wî yên jêr, jor û dûr. Mixabin heta ew ziman nebe zimanê perwerdeyê û ji dibistana seretayî heta zankoyê, neyê şixulandin, em ê hêza wî nizanibin û bi hêmayên wî yên veşartî nehesin.

Li gorî te xwedîderketina li folklorê çima girîng e û dê xwîner çî sûdê ji wan berhemên folklorî bibînin?

Bêguman her zimanek bi kelepora ku ji nav derketî geş dibe û dewlemend dibe. Ger berhemên folklorî yên zimanekî nebin, ew ziman nikare demeke dirêj bijî û li sedrê bimîne. Di folklor a gelan de reng, deng û bîna gelan heye. Dema mirov li folklor a gelekî binêre mirov dikare bigihîje taybetiyên wan gelan û wan nas bike.

Bi rastî dema nivîskarekî wiha çalak dibînim ku bi dehan berhemên wan hatine çapkirin, ez hinekî matmayî dimînim; çawa ew qas dema te çêbû, tu van berheman binivîsi?

Bêguman veqetandina demê ya ji kar û xebatekê re fedakarî dixwaze û divê mirov ji hin sefahiyan bibore lê



Ji ber ku ziman parçeyek ji nasnameya mirov e, çand û kelepora ku mirov di nav wê de mezin dibe jî di pêkhatina nasnameya mirov de xwedî roleke mezin e. Divê mirov ji kaniya kelepora jê tê têretêr vexwe. Sûdê ji wê werbigire û berhemên xwe jî ne dûrî wê biafirîne

di vê mijarê de ya girîng plankirina demê ye. Ger nivîskarek dikari be dema xwe ya di rojekê de bi plan bi kar bîne dê bi ser bikeve. Çawa ku nivîskarek nexwîne nikare biafirîne, lazim e bûyerên rojane yên li dinyayê diqewimin jî bişopîne. Ger ne wisa be dê li derveyî geşedanên li dinyayê bimîne. Ez bixwe herî zêde 5 seatan radizê, saetêke dimeşim û dema mayî jî bi tevahî li xwendin û nivîsandinê xerc dikim.

Berhema te ya dawî ya Gotinên Pêşîyan ku ji 4 cildan (50 hezar gotin) pêk tê, wekî ferhenga herî mezin a gotinên pêşîyan tê binavkirin. Te ev qas gotin çawa peyda kirin û berhevkirina wan çî qas dem girt?

Belê di wê berhemê de 27 hezar gotinên min bixwe, ji qadê û devê jêder û çavkaniyan tomar kirine hene. Ên din jî gotinên ji berhemên din ên heta niha hatine nivîsîn in ku min di dawiya berhemê de fihrista wan daye. Min pêşî hemû gotinên

heyî yên li gor mijarên wekî dostî, hevaltî, dayik, bav, mêr, jin, zarok û gelek serenavên din ên weke van bi 235 beşan dabeş kirin. Paşê min ew serenav li gor rêza ‘a-b-c’ kirin rêzê. Her beş di nav xwe de li gor rêzika tipên alfabe yê hatîye rêz kirin. Min ji bo her gotineke li gor agahî û salixdana jêderan şiroveyek nivîsi. Yên varyantên wan hene min li binî nivîsiye û yên hinekan jî min çîrokên wan nivîsi. Di vê berhemê de tiştekî din ê balkêş jî ew e ku min peyv û gotinên herêmi ku herkes nizane tên çî wateyê di jêrenotan de şîrove kirin. Hêjmara wan peyvên nêzî 5 hezaran e û ew jî ji bo gencîneya peyvên zimanê kurdî qezencek e.

Beriya niha te pirtûkek bi navê ‘Di gotinên pêşîyan kurdan de jin’ jî çap kiribû. Tevî ku hin gotinên wekî ‘Şêr şêr e çî jin e çî mêr e’ hene jî lê gelek gotinên pêşîyan hene ku bi çavekî kêr li jinê dinêrin. Gotina te çî ye ji bo vê?

Şik nîn e ku ew rexneyên bi wî rengî ji kêzanan û nenasîna folklor a gel tên. Divê mirov beriya her tiştî zanibe dê çawa ji folklor a gel sûdê werbigire. Weke dibêjin: “Ji hezar gotin û nesihet, yek nakeve serê mirovê bêdewlet.” Ew kesên gotinên weke dur û sedefan ku ji parzûnê dîroke yê ji cerebeyan pêkhatî re darivî weke kêmanî dibînin, divê berî her tiştî li çarçoveya gotinê binêrin, ka di bin

kîjan şertan de, di kîjan demê de, çawa, çima û ji bo çî hatîye gotin. Ger ne wisa be mirov nikare ji wan gotinan fam bike û sûdê ji wan werbigire.

Bêguman kêr be ji gotinên sedema gotina wan ji holê rabûbin jî hene lê ew gotin bixwe winda dibin, lew ku pêdivî bi heyîn û gotina wê namîne. Yanî bi kurtasî pêşîyan çî gotibin rast gotine, divê mirov sûdê ji wan werbigire. Dema pêşî dibêjin; “Marê bi te negire Xwedê hezar sal emir bidê” divê mirov nebêje marê ku bi min negire, dê bi nasekî te bigire. Ji ber ku peywendiya bi vî rengî fikirîne bi gotinê re tune ye. Lew ku ew gotin dibêje: “Kesê ku zirara xwe li te nebe, bila di nav heyîn û dewlemendiyê de be û gelek bijî.”

Di dawiya vê hevpeyvînê de dibêjim mala te ava, ji bo vê derfetê. Heke gotineke te ji bo rojnameyê û xwînerên wê hebe ji kerema xwe fermo bêje.

Ji ber ku zimanê mirov parçeyek ji nasnameya mirov e, çand û kelepora ku mirov di nav wê de mezin dibe jî di pêkhatina nasnameya mirov de xwedî roleke mezin e.

Divê mirov ji kaniya kelepora ku mirov jê tê têretêr vexwe. Sûdê ji wê werbigire û berhemên xwe jî ne dûrî wê biafirîne. Heke berhemek bîna kelepora xwe ranehêle, bêkok dibe. Gelek nivîskar û berhemên gerdûnî hene ku hemû jî bîn, reng û dengê kelepora ku tê de zayî hiltînin...



Mehmet Oncu kî ye?

Di sala 1961’î de, li taxa Xarxarê ya Semsûrê ji dayik bûye. Dibistana seretayî û ya navîn li Semsûrê xwendine û ji Zanîngeha Anadoluyê Beşa Kargeriyê mezûn bûye. Nivîskar, ji sala 1983’yan û vir de, li ser folklor kurdî dixebite û bi navê “Hemo Pêşeng” gelek berhem, nivîs û helbestên wî di kovar, rojname û malperan de hatine weşandin. Gotar û nivîsên wî yên li ser folklor kurdî jî nemaze di kovarên wekî Zend, Rewşen, Nûbihar, Govend, Jiyana Rewşen, Kovara W’yê de weşiyane.

Salihê Nehsalî

Mîran Dilêr

Navê min Salihê Nehsalî ye, gundê me dikeve li rojhilatê Kobanî. Dema DAIŞ êrîşî gundê me kir, kes li gund nema; bavê min ji diya min re got hûn jî bi aliyê sînor ve herin bila Salih li cem min bimîne. Bavê min, temenê wî nêzî heştêyî e. Wî her tim nimêja xwe li mizgeftê dikir; wexta xwe bi zikir û bi xwendina quranê derbas dikir.

Dengê çekan ji nav gund dihat, ji tirsan çongê min dilerizîn, min nexwest bala min biçe ser tîrsa min. Min bi tiliya xwe li ser axê xêz dikir û bi vinevina melodyekê di ber xwe de distira. Carekê min dît ez û bavê xwe em di nav tozê de man. Otombîleke spî li ber me sekînî. Gelek kes ji otombîlê peyabûn, bi kincên reş û dora devê wan girtî. Yek ji wan bi lez hat û bi hêl destê xwe de sînga bavê min. Himîniya parsîyan di guhê min de mîna zingîniyekê viz bû û got hemû gundî çûne ser sînor hew tenê tu li gund mayî. Li benda bersivê nesekînî û bi carekê mîna hovekî bi riyê bavê min ê dirêj girt û kaş kir, ew riyê bavê min ê dirêj her ku ez û birayê xwe li dora wî kom dibûn, me bi tiliyên xwe yên biçûk di nav riyê wî yê dirêj de dipalikand.

Wî çêr kir û lanetan li bavê min anî û jê re got, “Tew xwe kiriye sofî jî. Zû bi de pêşiya min, em ê we bibin ba emîr ka wê çi di derheqê we de bibêje.”

Em li paşiya otombîlê siwar kirin û piçekî em li nav gund gerandin. Min çavê xwe li her derê digerland, tu kes li gund nemabû ji bilî min û bavê min. Dema em gihîştin cem emîr, çavê min li dînê gundê me ket, li ber wan digeriya û lava dikir ji bû çixareyekê. Ji ber ku li cem DAIŞê çixare qedexe bû; nîzanim qedexeya çixareyê ji bo hemûyan bû an tenê ji bo gel bû. Li cem emîr em dan erdê û emîr navê me

pirsî. Bavê min bersiv da.

Min tim li paş xwe, li dînê gund dinihêrî. Nizanim ku emîr çi dipirsî û digot. Bi carekê bi milê min girtin û ez rakirim. Got hûn ê bi me re li nav gund bigerin û careke din em li nav gund gerandin. Roja din min li pişt gund dinihêrî, kaymonên bar ji gund derdiketin. Bi kêfa dilê xwe malên gundiyan didizîn.


Bi şev me dengê leşkeran li ber malê bihîst. Bavê min hêz da xwe û di pencereyê re nihêrî. Yek ji wan qîriya û got nenihêre qewad.

Bavê min got ev naletî pezê me didizin, divê em îşev ji gund derkevin, xwedê dizane wê sibê çi bi me bikin. Demeke şevê bavê min ez ji xew şiyar kirim û got Saliho em ê birevin hişyar be. Em derketin. Şev reş bû çavê min li xew bû. Min tişteke nedidît, tenê dimeşim û dilikumîm. Bavê min bi destê min girtbû. Bi carekê dengê leşkeran ji nêz ve hat û em rawestiyan. Wan da pêşiya me û çûn di şevreşê de em nedîtin. Me hêz da xwe û bi rê ketin.

Li gundê ber sînor seyê gund bi me hisîyan û kirine rewerew. Bavê min ez hildam hambêza xwe û bi lez meşiya. Ji min re digot netirse hindik ma em bigihîjin rêya hesinî. (xeta tîrênê ya Bakur û Rojava ji hev diqetîne) Me sînor derbas kir. Em li hinek gundiyan rast hatin. Bavê min bi kelegirî bû, mîna zarokekî winda bibe û çav li xwedîyan bikeve. Ji nişkê ve ban kir û got looo Hemoo Hecîîî, îbooo lawooo tişteke li gund nema, nema, gişkî hatin dizîn û giriya!

Navê min Salihê Nehsalî ye. Ez li wir bûm. Min hemû çîrok li wir hiştin; çîrokên ku dê û bavê min ji min re gotibûn... Lîstikeke me hebû. Her şev min û birayê xwe me diîst; ew jî li wir man, ew li wir û ez li vir...

*Ev nivîs ji rastîyekê hatiye nivîsîn.



Necat Ayaz

Dejenerasyon û zimankujî

Di dawîya sedsala 16’an de Îngilîzên ji xwe bawer, êdî li hember berxwedana aristokrasiya Îrlandayê gav bi gav nêzikî serkeftina dawî dibin. Di encama êrîşên nêzikî 400 salan dom kiribûn, hema hema li her aliyê giravê otorîteya monarşiya Londonê hatibû sazkirin lê desthilatên anglo-sakson nikarin serkeftinên xwe yên leşkerî veguherînin serkeftina zimanî û ji bo vê li çareyan digerin. Serdestiya Îngilîzî ya li giravê li aliyekî, Îngilîzên li giravê hatine bicihkirin, di nav demê de terka zimanê xwe dikin û dest bi axaftina galîkî dikin. Nivîskarê Îngilîz Edmund Spencer (1596) di berhemeke xwe de bi rêya diyaloga di navbera Îrenîûs û Eûdoksûs de vê rewşê wisa vedibêje:

Îrenîûs: Tiştekî çiqas ecêb e ku di nav Îngilîzan de bi zimanê Îrlandî bê axaftin? Tiştekî sosret e ku miletekî ji zimanê miletekî din hez bike. Ev, karê kesên çepel e û sedema gelekî xerabîyan e.

Axaftina bi zimanekî din, ji aliyê nivîskarên Îngilîz ve wekî "dejenerasyon"ê tê binavkirin û ji wê demê û şûn ve ev peyv di ferhengan de çiyê xwe digire. Helbet ev kesên ji bo asîmîlasyonê Îngilîzan a di nav Îrlandîyan de hawar dikin, li aliyekî din jî ji bo hilweşîna zimanê galîkî plan û projeyên asîmîlasyonê pêşkêşî desthilatan dikin lê hevkarîya wan a bi kolonyalîzma Îngilîzan re ne tê de, wateya ku wan li peyva dejenerasyonê bar kiriye heqîqetekê îfade dike: Axaftina bi zimanekî din dejenerasyon e!

Asîmîlasyona cotkarên Îngilîz a di nav hawîrdora galîk de bi polîtîkayên qraliyetê hat sekindandin û bi vî awayî dawî li "dejenerasyona" zimanî hat anîn. Li eniya dijber jî li dijî dejenerasyona Îrlandîyên bi Îngilîzî diaxivîn înnîsyatîfên xurt derketin holê. Armancên wan cuda bin jî ji bo her du alîyan parastina ziman mijareke pir zêde krîtîk bû.

Îcar dema em bi vê agahiya dîrokî li meseleya zimanê kurdî dinêrin, em bi rastîyeke kambax re rû bi rû dimînin. Li çaraliyê welêt, çi mezin çi jî biçûk, hema bêje li hemû bajaran axaftina bi tirkî normalîze bûye. Tiştê ji vê jî ecêbtir ev e, di civakê de li hemberî vê zimankujîya ewqas zelal heta niha tu reaksiyoneke cidî derneketiye holê. Yek ji sedemên vê yekê, hilweşandina peyva "dejenerasyonê" ye. Axaftina bi tirkî, ji ber helwesta erênî ya elîtên kurd a ji bo vî zimanî, bi salan e "dejenerasyona zimanî" nayê qebûlîkirin. Wekî li gelek aliyên cîhanê, kuştina ziman bi hilweşandina wateya vê têgehê re paralel bi rê ve çûye.

Eger hûn ji min bipirsîn "gelo di vê mijarê de ferqa me û xelkê ji hev çî ye?" bersiva min amade ye: Li welatên din şidet jî tê de, xelkê qiyametê rakir û li dijî zimankujîyê li ber xwe dan lê li cem me, tevna vê proseya jandar bi regekî wisa hatiye danîn ku hemû derfetên lîdîrderketinê yek bi yek ji destê civakê digire. Bi gotineke din, çavên divê bibînin kor û zimanên divê bibêjin lal bûne. Wisa xuya ye, ji bo di vê dema zimankujîyê de tu xirecir pêk neyên, bi kurdan re konsensûsek jî çêbûye. Îcar ez ê ji we bipirsim: Ev çawa mimkûn e û çima?

Korîtiya Jose Saramago

Dogan Hejar

Jose Saramago di pirtûka xwe ya bi navê ‘Korîtî’yê de, bi metafora korbûnê têkiliya cehaletê û pîrsgirêkên civakî nîşan dide.

Pirtûk bi derketin û belavbûna şewba korîtîyê dest pê dike ku nivîskar mîna bibêje cehalet biperok (belav-

kar) e û kî çav li korekî dikeve ew jî kor dibe. Korên di romanê de berevajiyê nebînên jiyana rastî ne; ew tenê reş û spî dibînin.

Nivîskar bi vê korîtiya spîbînê ve rewşa mirovê hemdem vedibêje yê di nav ew çend agahiyên felsefî, dîrokî, zanistî û teknîkî de nezaniyê dijî.

Kesên bi şewba korîtîyê dikevin, ji

hêla dewletê ve li cihekê tîn komîrin.

Çend kes li wir hebin, xwarin û av li gor hejmara wan tê dayîn lê piştî demekê kesek bi awayekî demançeyekê bi dest dixê û bi wê dest datîne ser xwarinan.

Ew êdî dikare ji bo dayîna xwarinê mêr û jinan di xizmeta xwe de bixebitîne û jinan weke objeyên zayendî bi

kar bîne.

Bi metafora demançe û kesê ew bi dest xistiye, nivîskar têkiliya cehaletê bi tevgera bûye ku jê her cure xirabiyê dertê û desthiladariyê nîşanî me dide.

Korîtî bi tenê bi wargeha koran sî-nordar namîne û her diçe belavtir dibe heta ku tevahiya welat dike bin siya xwe.

Êdî navê din ê jiyanê dibe talan, dibe destavêtin, dibe zordarî û zîlm...

Divê em bizanibin, di erebî de zîlm hem bi wateya ‘zîlmê’ ye hem jî bi wateya ‘tarîtiyê’ ye. Di kurdî de jî zîlm ‘sîtem’ e dibe ku ew jî mîna peyva ‘siyah’ ji ‘sî’yê hatiye. Pêşiyên ereb û kurdan mîna ku bibêjin li cihê ku korbûn-tarîtî angî cehalet-nezanî hebe li wir zîlm û sîtem jî heye û li cihê ku zîlm û sîtem heye li wir nezani û tarîtî jî heye.

Jose Saramago bi pirtûka xwe ya ‘Korîtî’yê, mîna ku pêşiyên kurd û ereb ên peyvên ‘sîtem’ û ‘zîlm’ê dariştine, peşend bike ku peywendîya korîtî û xirabiyê, nezaniyê û sîtemê nîşanî me dide.



Dem dema yekitiya kurdan e

| Navenda Nûçeyan

Li bakurê Kurdistanê demek dirêj tifaqa partiyên kurdistanî di nav liv û tevgerê de bûn. Herî dawî piştî êrîş û binçavkirinên li ser HDP’ê, di 24’ê cotmehê de nûnerên partiyên kurdî di çerçoveya tifaqa kurdî de hatibûn gel hev.

Der barê vê civîn û mijara yekitiya neteweyî de em bi Serokê KKP’ê Sînan Çiftiyurek, parlamenterê HDP’ê yê Amedê Îmam Taşçier û serokê PDK-T’ê Mehmed Emîn Kardaş re axivîn.

Serokê Partiya Komunîst a Kurdistanê (KKP) Sînan Çiftiyurek der barê yekitiya kurdî de diyar kir ku civîna 24’ê cotmehê li ser du armancên bingehtî pêk hatiye û wiha got: “Armanca yekemîn a civîna me; nîrxandina êrîşên li ser siyaseta kurdan û HDP’ê bû. Ya duyemîn jî me xwest ji bo tifaqa kurdistanî bikeve nav liv û tevgerê. Di vê civînê de li gorî min peyamek baş û girîng hat dayîn ku ew jî mayindekirina tifaqa kurdistanî ya li Bakur bû. Lê ya herî girîng ew e ku em berdewamiya vê tifaqê bi hûrgulî, bi di-siplîn û bi îstikrar pêk bînin.”

‘Em bi biryar in!’

Çiftiyurek da zanîn ku salek berê li bakurê Kurdistanê wan dest bi xebatên tifaqa kurdî kiribûn lê ji ber sedema pandemîê wan xebatên xwe dane sekî-nandin û ev tişt anî ziman: “Jixwe em gi-hîştibûn merhaleya ku partiyên kurdistanî ji bo tifaqa bakurê Kurdistanê li hev bikin û nexşerêya wê jî hatibû diyarkirin. Komîsyonek ji bo têkiliyên bi gel re amade bû da ku li bajar û taxan, li gundan, li nav gel bigeriyana û bi hin pêşengên civakê re, bi eşîran re, bi sazi-yên sivil re dê hatibana gel hev. Ya duyem jî avakirina kongreyek neteweyî bû. Ji bo naveroka vê kongreyê li Amed, Stenbol û Ewropayê dê vê komîsyonê konferansên amadekariyê pêk anibana. Di vê civîna 24’ê cotmehê de jî hat fam-kinin ku em tev jî hê li ser biryara xwe ne û li Kurdistanê bakur em dixwazin ku ti-

Der barê civîna yekitiya neteweyî de serokê KKP’ê, parlamenterê HDP’ê û serokê PDK-T’ê axivîn û bang li hemû aliyên kurd kirin ku dem dema yekitiya neteweyî ye

faqek mayinde ava bikin û me cardin birayara avakirina komîsyonan da. Di demeke kurt de jî em ê bi raya giştî re parve bikin.”

Berjewendî esas in!

Sînan Çiftiyurek diyar kir ku KKP’ê hem li Bakur hem jî li her sê perçeyên Kurdistanê ne wek taktîk, lê bi stratejîk li tifaqa kurdî dinêre û wiha pêde çû: “Îro em nikarin tenê ji bo hin berjewen-di-yên partiyan tev bigerin. Hem li Başûr ji bo rêveberiya herêmê hem jî ji bo Ro-ja-va hewce ye nêzîkatî ne taktîkî bin, stratejîk bin û tenê berjewendi-yên par-tiyan ne li pêş bin. Niha ji bo me xala esasî berjewendi-yên gelê kurd e.”

‘Êrîşkar li benda fersendan e’

Serokê KKP’ê Sînan Çiftiyurek di da-wiya axaftina xwe de bang li gelê kurd û siyasetmedaran kir û wiha got: “Gelê kurd di rojên zor û zehmet re derbas dibe. Ji dewleta Îranê heta ya Tirkiyeyê îro li ser Rojava bi Rûsyayê re dikevin nav bazaran. Ev jî tê maneya ku dema fersendekê bibînin dê êrîşî Rojava bikin. Bi kurtasî hewce ye em kurd li çar par-çeyên Kurdistanê li ser berjewendi-yên xwe werin gel hev.”

Bila kurd yekitiya xwe pêk bînin

Parlementerê HDP’ê yê Amedê Îmam Taşçier der barê yekitiya nete-weyî de axivî û diyar kir ku HDP ji du milan ve li ber xwe dide û wiha got: “HDP ji aliyekî ve li Tirkiyeyê ji bo eniya demokrasiyê kar dike û dixwaze ava bike; ji aliyê din ve jî ji bo yekitiya kurdan li Kurdistanê li ber xwe dide. Civîna 24’ê cotmehê jî ji ber vê yekê girîng bû.”

Taşçier da zanîn ku sedema êrîşên li ser HDP’ê bi mijara yekitiyê ve ji girê-dayî ye û ev tişt anî ziman: “Desthilat-

darî ji her alî ve êrîşî kurdan dike. Divê bê zanîn ku heta yekitî pêk neyê dê êrî-şên li ser kurdan bidome. Ji ber vê jî ye-kitiya kurdan bi qîmet e.”

Her wiha Taşçier bang li partî û sazi-yên kurdan kir û axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Dem dema yekitiyê ye. Îro dinya li ser kurdan siyasetê dimeşîne û hewce ye kurd jî êdî ji bo yekitiya xwe têkevin nav liv û tevgerê.”

Şerma herî mezin

Di heman mijarê de serokê Partiya Demokrat a Kurdistan-Tirkiyeyê (PDK-T) Mehmet Emîn Kardaş diyar kir ku ar-manca wan a tevlêbûna civînê hevkarî-yek mayînde ye û ev tişt anî ziman: “Em wek partiya Demokrat a Kurdistanê di-bêjin ku ger kurd di sedsala 21’emîn de yekitiya xwe pêk neyîn ev şermeke mezin e. Ji ber vê jî hewceye em partî, sazî û tevgerên kurd li Bakur di asta nîr-xên neteweya kurd de û bi siyaseteke stratejîk yekitiyê mayinde bikin. Ev yek nebe nabe.”

Bila partiyên kurd tevlê bibin

Kardaş, têkildarî hin partiyên kurd ku beşdarî tifaqê nebûne jî destnîşan kir ku dema cara yekem xwestine bi parti-yên din re ji bo tifaqê bên gel hev lê wan red kirine û wiha domand: “Em dix-wazin wan partiyên derveyî tifaqê mane bi xebatên xwe yên nû wan ziyaret bikin. Banga min ew e ku her partî û ke-sayet cihê xwe di nava vê tifaqê bigire.”

‘Kurdistan ya me tevan e’

Her wiha Serokê PDK-T’ê Kardaş destnîşan kir ku hewce ye ji bo doza kurdî êdî ew tev bi awayekî profesyo-nel tevbigerin û axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Kurdistan ya me tevan e. hewce ye em bi hev bişêwirin û bi hev re biryar bidin.”



Mem Avba

Minet ji neyaran nabe

Pêvajoya alozî û qeyranan bi hemû dijawariya xwe didome. Cîhan ber bi nediyariyeke tarî ve diçe, tengi-jîn û xitimîneke mezin a pergala dewletî û desthilatdariyê dijî. Kare-sat li ser karesatan diqewimin. Pandemiya koronayê cîhan bi giştî xistiye dorpêça xwe û bêhn lê çî-kandiye.

Pergala global, desthilatdar û mêtîngerên ku niha cîhanê bi rê ve dibin, rewşa pandemiyê bi awayekî gelek xirab li dijî civakan ji bo ber-jewendi-yên xwe bi kar tînin. Civaka li ber fetisînê ye û ew bêhenase hiştine.

Li Kurdistanê jî pêvajoyeke di-j-war û metirsîdar a pergalên dagir-ker û mêtînger tê ferzkinin. Li dijî vê mixabin kurdan nekarî yekiti-yeke têkel pêk bînin, ne jî êrîşên dagirkeriyê bidin rawestandin. Ango metirsiya li ser destkeftiyên kurdan veguherî metirsiya li ser hebûna wan jî! Çimkî êdî bi awa-yekî bêarî zimandirêjî li hebûna kurdan tê kirin; nîrx, pîrozî û dest-kefiyeke wan a dest navêtinê ne-hiştin. Her roj bi rûmet û kerameta gelê kurd tê lîstin! Destavêtin, gir-tin, zext, kuştin, talan hwd tiştên nekirî nemane. Li hemberî vê hêzên pêşeng ên kurd jî bi hel-westa heyî avê dikêşin aşê dagir-keriyê, çerxa hêrandina hebûna kurd zûtir didin ziviradin...!

Mixabin vê kambaxî û malwê-raniyê, kurd bi xwe tînin serê xwe. Gelo bi rastî jî dagirker ewqas bi hêz, zana û aqilmend in? Na! Çav-kaniya sereke ya vê parçebûn, bê-tifaqî, pêkneanîna yekrêzî û hestên netewebûnê ye. Mafê ti hêz, rêxis-tin û alîyan nîn e ku çarenûsa gelê kurd wiha bixin bin taserûfa dagir-keran, bikin qurbaniya berjewendi-yên xwe yên teng û takekesî; navê wê çi be bila bibe, pêşkêşî dijmin û dagirkeran bike! Nexasim mil bidî milê dagirkeran, pišta xwe li wan germ bikî! Navê vê tenê ne bira-kujî, ‘kurdqirî’ ye! Kî bibe sedema vê ne kurd, ne dîrok û ne jî mirova-hiya pêşverû nabexşîne!

Ma bi rastî jî kurd ji wî aqil, tê-gihiştin, pêşbînî, bîrefêhm û beh-reyê bêpar in ku nekaribin xwe ji bin nîrê dagirkerî û mêtîngeriyê rizgar bikin! Gelî efendîno! Kurdan xwe di van mijaran de îspat kiriye, êdî ker û kor û lal jî vê dilpakiya kurdan dizane. Hema van salên dawî ku her kesî hefza xwe ji DA-IŞ’ê dikir, kurdan lêda û ev qirêjiya bûyî bela serê mirovahiyê ji dîrokê rakir; tevahiya cîhanê jî bi heyranî temaşe kir! Lewre mirovahî deyn-

darê gelê kurd e...

Kurdan di serhildana Baban-zade, Simko, Mele Mûstefa Bar-zanî, Şêx Ûbeydullahê Nehrî, Mîr Bedirxan, Koçgirî, Şêx Seîd, Agirî, Dêrsim hwd de nekarînin bibin yek ku niha kurd ji destê dagirkeran jana dîrokê ya herî mezin dikêşin! Aqilê kolektîf ê kurdan li dora dest-keftiyên Başûr, yên Rojava; dîsa Bakur, Rojhilat û niha jî Şengalê nekarînin yekbûn û tifaqa xwe çêbi-kin, hesabên zilhêz û nokeran vala derxin. Ma hêzên pêşeng ên kur-dan ji vê qabiliyet û têgihîştinê dûr in? Bêguman na. Pêşîyan gotiye, ‘Minet ji neyar nabe, rîşê kotî ji xa-yinên nav me ye!’

Encam li holê ye. Sîstema dew-letî ya cîhanî asta xwe ya herî rezil, herî ketî û bînîrx dijî. Nexasim jî pergala dewleta tirk! Ev pergala har û çavsor ne xwedî ewqas hêz, aqil, ne jî ewqas kêrhatîye ku li ser kurdan vê zilmê pêk bîne. Sedema sereke ya vê siyasetê parçebûn û xêrnexwaziya hêzên kurdî ya ji bo hev e! Jixwe dema berdevkê dew-leta hov diaxive mirovahî pê di-kene, çawa dibe ewqas bikare kurdan bixapîne, berde pêşîra hev, lewre li ser pêşeroj û çarenûsa gelê kurd qirkirineke wiha nemer-dane bide ferzkinin! Niha li Bakur dagirkerî û hovîtiyeke dîrokê ya nehatî dîtin pêk tîne, nîvî zêdetir başûrê Kurdistanê dagir kiriye, li rojavayê Kurdistanê heman awayî, li Şengalê dixwaze destketiyên heyî bi giştî ji holê rake. Herî dawî bi piştgiyîra efendi-yên xwe DYA û NY’ê, dewlata Iraqê jî kire amûrê vê siyaseta xwe ya qirkirinê.

Madem niha êrîşeke topyekûn li ser gel, welat û hebûna kurdan heye, divê hêzên kurd jî vê berpîrs-yariya xwe ya exlaqî, wijdanî, we-latparêzî û dîrokî pêk bînin û guh bidin dengê zarîn û axîna gelê kurd ku ji xezeba vê hovîtiyê derînin.

Kahîn û astrologê navdar Nos-tradamûs (Michel de Nostredame) ku sedsala 16’an jiyaye, di kehanê-teke xwe de dibêje, ‘...pêşerojê dê kesek ji giraveke bi behrê dorpêç-kirî derkeve û rûyê cîhanê bigu-herê’. Îro ev derbirîna Nostradamûs pênasêya xwe di pa-radîgmaya Rêberê Gelê Kurd Ab-dullah Ocalan de dide der. Lewma heke kurd bi vê hişmendi-yê pêva-joyê bixwînin, dê vî şensê dîrokî ji dest bernedin. Li tevahiya cîhanê stêrka kurdan geş e. Lewma divê kurd vê çiraya geş ji bo ronîkirina pêşeroja xwe bi kar bînin û li dora wê bicivin; ne ji bo tarîkirinê..!



Hunermend, siyasetmedar û saziyên kurdistanî bang kirin

| Navenda Nûçeyan

Ev demeke dirêj e polîtîkayên Rêveberiya Herêma Kurdistanê ya dijkurdbûnê û ber-jewendi-yên malbatî dibe sedema pîrsgirê-kan. Ji dagirkirina Zîne Wertê, Heftenînê, Metîna û herî dawiyê Garê heta binçavki-rina rojnameger û siyasetmedaran êdî rê-veberiya Başûr li gor berjewendi-yên Tirkiyeyê tev digere. Ev helwest û sekna rêveberiya Başûr ji aliyê kurdan ve tê rex-

nekirin û wek gavên dîktatoriye tên dîtin. Polîtîkayên rêveberiya Başûr ji aliyên gelek siyasetmedar, sazî, rêxistinên kur-dan û hunermendan ve hatin rexnekirin.

Xetereya ‘birakujiyê’

Partî û saziyên kurdistanî yên li Ewro-payê hefta borî li dijî xetereya ‘birakujiyê’ daxuyaniyeke hevpar dabûn û bang li hemû sazî, rêxistin û dezgehên kurdistanî kiribûn ku li dijî xetereya şerê navxweyî dengê xwe bi awayekî xurt bilind bikin.

Partî û saziyên kurdistanî di daxuya-niya xwe ya hevpar de bal kişandibûn ser rewşa bi xetere û wiha gotibûn: “Demeke dirêj e ku li ser sinorê Bakur-Başûr û nexa-sim li Başûr rûdanên nebaş di rojevê de ne. Li gorî rewşa dawî li cihên wek Hefta-nîn, Garê, Metîna û hwd. zemîna şer tê amadekirin. Bêguman ev projeya kambax li gorî siyaseta dagirker û qirkeran çêdibe. Gazin ji dijmin nabe, ya hewceyî pê heye berxwedan e. Belê gazin û daxwaz ji tev-ger û rêberên kurd û Kurdistanê ye.”

Banga hunermendan

Têkildarî heman mijarê 237 huner-mendên kurdistanî bi daxuyaniyekê bal kişandibûn ser bûyerên metirsî-dar a li ser bicihkirina hêzên li he-rêmê û şerê kurd bi kurdan û ji bo çareseriyê banga diyalogê kiribûn.

Her wiha parlamenterên Parla-mentoya Herêma Kurdistanê jî diyar kirinbûn ku bi çi hincetê dibe bila bibe, divê şerê birakujiyê çênebe û gotibûn ku divê pîrsgirêkek siyasî di

navbera aliyên siyasî yên Kurdistanê de çênebe û banga yekrêziyê kirin.



Xwestin tecrîd bi dawî bibe

Wezîrê alman Michael Roth diyar kir ku divê Tirkiye li gorî rapora CPT'ê destûrê bide ku parêzer û malbat bi Rêberê PKK'ê Ocalan re hevdiştinê bikin

Navenda Nûçeyan

Komîteya Pêşgirtina li Îşkenceyê (CPT) di nav 21 salan de heta niha tenê 9 caran bi Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan re hevdiştin kirine. Herî dawî jî di 28-29'ê nîsana 2016'an de hevdiştin bi Ocalan re kiribûn û agahiyeke hevdiştinê nehatibûn parvekirin. Piştî vê yekê CPT, di 5'ê tebaxa 2020'an de da zanîn ku di sala 2019'an de jî girtîgeha Îmraliyê ziyaret kirine lê şert û mercên 2016'an neguherîne.

Têkildarî tecrîda li Îmraliyê hefteya borî parlamentera Partiya Çep Gokay Akbûlût pêşnûmepirs pêşkêşî hikûmeta federal a bi serokatiya serokwezîr An-

gela Merkel kiribû. Di pêşnûmepirsê de ev yek hatibû bibîrxistin: "Tecrîd li Îmraliyê mayînde bûye û li gel hişyariya sala 2016'an jî hîn tişteke nehatiye guhertin."

Pirsa şert û mercên li Îmraliyê
Akbûlût di pêşnûmepirsê de bal kişandibû ser astengkirina hevdiştinan a li Îmraliyê û ev pirs kiribû: "Di hevdiştinên we de yên bi nûnerên tirk re, şert û mercên li Îmraliyê tên rojevê yan na?"
Li ser navê hikûmetê, Wezîrê Dewletê yê ji Karên Ewropayê Berpirsiyar Michael Roth bersiv da pêşnûmepirsa Partiya Çep.
Roth bersiveke kurt da pêşnûmepirsê û bersiv li malpera meclisa federal hat weşandin. Roth ji Tirkiyeyê xwest ku

şertên Peymana Mafên Mirovan a Ewropayê (PMME) bi cih bîne ku ew jî endamê Konseya Ewropayê ye. Wezîrê alman destnîşan kir ku mafên têkildarî girtî û hikumxwaran ên bi PMME'yê hatine misogerkirin, divê neyên binpêkirin û wiha got: "Hem Yekitiya Ewropayê hem jî hikûmeta alman a federal, di hevdiştinan de yên bi Tirkiyeyê re, bendewariyên xwe yên di vê mijarê de bi rengekî aşkera radigihînin."

'Dawiyê li îşkenceyê bînin'
Wezîrê alman Michael Roth bal kişand ser rapora CPT'ê ya herî dawî ya li ser tecrîda li Îmraliyê û xwest ku şertên di raporê de tên xwestin bi cih bînin. Wezîr di vê mijarê de jî bi van gotinan bang li Enqereyê kir: "Wekî ku CPT'ê ragihand, ji bo dawî li her cure kiryarên li dijî mirovahiyê bê, ji bo malbat û parêzer dikaribin hevdiştinê bikin, hikûmeta federal bang li hikûmeta tirk dike."
Her wiha girtiye li Îmraliyê jî nikarin hev bibînin. Li ser vê mijarê jî wezîrê alman bang li hikûmeta tirk kir ku vê astengiyê rake.
Xwediyê pêşnûmepirsê parlamentera Partiya Çep Gokay Akbûlût jî diyar kir ku ew vê banga hikûmeta Merkel erênî dibînin û wiha got: "Piştî vê bangê divê Almanya Tirkiyeyê bişopîne bê ka ji bo sererastkirina şert û mercan û bida-wîkirina tecrîdê hewl dide yan na."



Êrîşên li Fransayê

Navenda Nûçeyan

Li Fransayê di 16'ê cotmehê de mamos-tayê bi navê Samuel Paty ji aliyê Abdoulakh A. (18) hat kuştin. Hat ragihandin ku ji ber mamoste Paty di polê de karîkaturê kovara Charlie Hebdo'yê yê der barê Hz. Muhammed (2015) de, wek yek ji mînakên azadiya xweifadekirinê nîşan daye hatiye kuştin.

Piştî vê bûyerê, hikûmeta Fransayê ev yek wek 'êrîşeke li dijî komara Fransayê' pênase kiri û ji aliyên gelên Fransayê ve jî qetilkirina Samuel Paty hatibû protestokirin.

Li Fransayê pişt re li ser diwarên şaredariyên bajarên Toulouse û Montpellierê jî karîkatûrên Charlie Hebdo'yê hatin nîşandan. Li ser vê yekê jî serokkomarê Tirkiyeyê Recep Tayyip Erdogan bertek

nîşan da û Emmanuel Macron bi gotinên 'dijminatîya Fransayê ya li hemberî îslamê dijminatîya gelê tirk e jî', 'divê Macron ji aliyê mejî ve bê tedawîkirin' rexne kir. Erdogan her wiha banga boykotkirina malên Fransayê kir. Piştî gotinên Erdogan Fransayê jî Tirkiye wek 'li hember Fransayê teşwîqî nefretê dike' hişyar kir.
Herî dawî hefteya borî li dêra Notre Dame ya Nîce ya Fransayê jî ji aliyê Brahim Aïoussaoî ve êrîşeke bi kêran pêk hat û di êrîşê de du jê jin sê kes hatin kuştin. Şaredarê Nîceyê li ser bûyerê diyar kir ku dema êrîşkar hatiye binçavkirin gelek caran gotiye 'Allah û ekber'.
Li bajarê Cedde yê Erebestana Siûdiyê ji aliyê kesekî 30 salî ve êrîş konsolxaneyê Fransayê hat kirin û parêzvanek birîndar bû. Kesê êrîşkar ji aliyê polîsan ve hat binçavkirin û der barê bûyerê de lêkolîn hat destpêkirin.

Bi payîzê re hejmara pêketiyan zêdetir bû

Bi demsala payîzê re şewba vîrûsa Kovîd-19'ê her diçe li ser rûyê cîhanê belavtir dibe û bi vê yekê ve girêdayî li her welatekî tedbîrên cuda tên girtin. Li gor daneyên dawî, li tevahiya cîhanê hejmara kesên bi şewbê ketine ji 45 milyonî derbas bû û yên jiyan xwe ji dest dane jî gihîştîye milyonek û

200 hezar kesî.
Di serî de welatên Ewropayê, gelek welat her diçe tedbîr û qexexeyan zêdetir dikin lê welatên wek Tirkiyeyê jî ji aliyê tedbîran ve tê zanîn ku tu tedbîrên rasteqîn ên dikaribin rê li ber belavbûna şewbê bigirin nayên girtin. Heta niha jî hem li Tirkiyeyê

hem jî li tevahiya bakurê Kurdistanê şewba vîrûsa koronayê bûye sedema mirina bi hezaran kesan û hê jî dibe.
Heftêya borî li bajarên bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê herî kêm 372 kesan jiyan xwe ji dest dan û bi hezaran kes jî bi şewbê ketin. Her wiha tevî tedbîrên girtin

jî li başûrê Kurdistanê jî hejmara kesên bi şewbê dikevin û jiyan xwe ji dest didin zêde dibe. Li gor daneyên dawî hejmara pêketiyan koronayê li Herêma Kurdistanê gihîşt 74 hezar û 334 kesan û hejmara kesên jiyan xwe ji dest dan jî ji 2 hezar û 500'î derbas bû.

AMED



Xweşkanî

Felemez Ulug

Roja azadiyê!

Di van rojan ku êrîşên li ser bakur û rojhilatê Sûriyeyê her diçe zêde dibin, aliyên aştxwaz û demokrat xwe ji bo pîrozkirina 1'ê Mijdarê Roja Kobanê ya Cîhanî amade dikin.
Bêguman şoreşa Rojava di sedsala 21'emîn de ji bo gelên bindest û şoreşger bû hêviya azadiyê. Ev şoreşa ku di bingeha wê de Paradîgmaya Konfederalîzma Demokratîk heye, ji niha ve bûye hêviya civakên bindest.
Şoreşa Rojava ya ku li ser vê pergale hatiye hûnandin, ezmûna xwe ya herî mezin di şerê dijî DAİŞ'ê de da. Bi êrîşên DAİŞ'ê yên di 15'ê Îlona 2014'an dest pê kir de, derket holê ku civaka bi vê pergale ve hatiye rêxistinkirin çiqas dikare di xwe de asta têkoşîn û berxwedanê ava bike.
Berxwedana gervanên YPG û YPJ'ê ya li 134 rojan, ji bo gelên cîhanê jî bû çavkaniya têkoşîn û berxwedanê. Lewma li gelek deverên cîhanê

kesên ku qet heya niha dengê kurd û Kurdistanê nebihiştine ji bo di vê têkoşîna mafdar û xwedî îrade de cih bigirin herikîn Rojava.
Ji bo piştivaniya berxwedana li dijî DAİŞ û çeteyên ji hêla dewletên dagirker ve tên rêxistinkirin gelên cîhanê piştigiriya xwe ji bo gelê kurd ragihand. Ev herêma ku qet ne di xema kesî de bû, di demeke kurt de bû cihê şervan û şoreşgerên enternasyonalîst. Ev kesên bi hemû hebûna xwe ve baweriya wan bi wekhevî û îradeya gelan heye, li vê derê dikarî xwe îfade bikin û li dijî zilm û zordestiyê têbikoşin.
Yekem car e gelê kurd bi têkoşîn û berxwedana xwe, li qada nevnete-veyî wisa deng veda. Ev berxwedan sînor derbas kirin û bû cîhanî. Ji bo ev berxwedan û têkoşîn neyê jibîrkirin û pira gelan a li dijî zilm, dagirkerî, qirkirin û înkare, bi îlankirina 1'ê Mij-

darê Roja Kobanê ya Cîhanî şoreş hat tacîdkirin.
Ev berxwedana destanî ya li Kobanê û tevahiya Rojava li dijî çeteyên DAİŞ'ê bi navê mirovahiyê hate meşandin, ne tenê li Rojava û Rojhilata Navîn, li nav tevahiya mirovahiyê sêmpatî û piştigiriyeke mezin da afirand. Şoreşa Rojava ne tenê ji aliyê kurd, ereb, asûran ve pêk hat, ji Ewropayê heta Amerîkayê, ji Kanadayê heta Rojhilatê Dûr bi berxwedana mirovên enternasyonalîst gihast astê herî bilind.
Hêzên dagirker li Rojava negihîştin armanca xwe ya kirêt. Niha bi plan û tevgerên cuda li pey têkbirina vê şorêşê ne. Dagirkirina Efrîn, Serêkanî û Girê Spî parçeyên vê plana qirêj in.
Ji bo şoreşa Rojava dorpêç bikin û wê bifetisînin, serî li hemû rê û rêbazan didin. Ev xebatên ku di pêşengiya

dewleta tirk de tên meşandin ji xwe re hevalbend mîna PDK'ê jî daye çêkirin. Di vê rêya reş û tarî de, kurdên rêya xwe wînda kirine dixwazin civaka kurd jî bi xwe re bikişînin nav vê tarîtiyê.
Ji destpêkê ve dewleta tirk hem dixwaze şoreşê bifetisîne, hem jî çeteyên DAİŞ'ê ji nû ve derxe holê û bi rêya van çeteyan xewn û xeyalên xwe yên hikumkirina li herêmê bi cih bîne. Bêguman ev êrîşên li ser herêmê ne tenê ji bo gelê kurd, ji bo aramî û ewlehiya herêmê jî metirsiyek mezin e. Lewma parastin û xwedîderketina li Rojava ku bi nîrxê hevpar ê mirovahiyê hatiye bidestxistin, xwedîderketina li nîrxên mirovahiyê ye.
Gelên cîhanê yên li dijî êrîşên DAİŞ û dewletên dagirker xwedî li Rojava derketin, bi wesîleya 1'ê Mijdarê Roja Kobanê ya Cîhanî jî dengê xwe yê azadî û serkeftinê li cîhanê

bilind dikin.
Di vir de ya girîng ew e ku gelê kurd bi sazî, rêxistin û partiyan xwe ve xwedî li vî nîrxê hevpar derkeve û ji bo azadiya gelê kurd a daîmî têbikoşe lê heyf û mixabin ku hin aliyên ku bi nasnameya kurdî tevdiagerin, li şûna xwedîderketin û parastina van nîrxan, di nav hewildanên têkbirina wan de ne. Ev neyartiya li gelê kurd hêdî hêdî gihîştîye asta dijminatîyê!
Hêvî û daxwaza gelê kurd her tim ew e ku di nav partî û rêxistinên kurdî de yekîtiya ava bibe lê partiyan xwedî van kiryarên xirab çiqas dikarin di xwe de îradeya yekîtiyê ava bikin cihê gumanê ye.
A girîng ew e ku di salvegera 1'ê Mijdarê Roja Kobanê ya Cîhanî de asta daxwaza azadî û têkoşînê di gelê kurd de mîna roja destpêkê germ û bi coş e. Ev jî bersiva herî xurt e ji bo hêzên neyartiya gelê kurd dikin.



Bilal Ata Aktaş

Odeya Arthur Rimbaudî yê Mêrmindal û Bêhedan

•Aden

Li Fransayê hewa li gor kêfa xwe ye. Tu rojekê dibînî erd û esman qul bûye û xulexula baranê ye lê sibetira rojê hewa req çîksayî ye û fanoriyê te lixwekirî li te heram dike. Ez rabim bêjim êdî hînî vî halê dînihiyê bûme derew e. Payîz li me heram bûye. Ji zivistanê jî ji kesên ji zivistanê hez dikin jî hez nakim. Xwedê gunehê min bixe stûyê romannivîsên rûs.

Dîsa rojêke wilo zilmane, 19’ê cot-mehê serê sibê zû rabûm cûm zan-koyê. Şilûpil ketim dersê; piştî nîv saetê dîsa şilûpil jê derketim. Kul bi dersên yekşemê were, sebra Eyub jî hebe bi te re, piştî nîv saetê ji dinê jî ji heyatê jî aciz dibî; ez jî wilo aciz bûm.

Min berê xwe hotela biçûk a li hember zankoyê. Par jî min digot ha îro ha sibê ez ê biçim lê ji ber xemsa-riyê xwedê nekir nesib.

Hotela li hember, bi navê xwe l’Hôtel Cluny-Sorbonne ye. Bi plaketa li ser dîwarê xwe menşûr e:



“Niha odeyeke min a xweşik heye Arthur Rimbaud Hôtela Cluny – hezîrana 1872’an Hevalên Rimbaudî”

Hatim ber deriyê hotelê; min ça-kêtê xwe dûz kir û ketim hundir. Ya Alla. Xirîniya mêrikekî qelew û navsale bû li resepsiyonê. Mêrik li ser sende-liyê pal dabû. Ya rebbî. Min got « mosyo! » mosyoyî got hirc û niç û rabû çilm û pozê xwe paqij kir. Paşê çawa hat ser hemdê xwe, got “kerem ke ezbenî”. Min got “hatime bo çîroka Arthur Rimbaud”. Mêrik bêyi ku pirseke din ji min bike mîna gedeyên li Gola Halîl ul-Rehman dest bi çîroka xwe ya jiberkirî kir. “Arthur Rimbaud di sala hezar û he...” Min got “ka bise mosyo, bira ew plaketa li ber derî rast e?” Got “helbet” û qala serpêhatiya kin a Rimba-udyê li wir kir.

•Harar

Sala 1870’yî, gava ku Prûsya êrîşî Fransayê dike, Hôtel Cluny-Sorbonne ya li orta Parîsê jî ji vî şerî bêpar na-mîne û çend derban dixwe. Fransa nikare xwe li ber prûs-yayîyan bigire û têk diçe. Wek encama vê cengê Almanya ya yekgirtî ava dibe û Parîs dikeve nav kaosekê. Geremola hanê jî bivê nevê bandora xwe li ser jiyana rojane û rewşenbîriyê dike. Hotel Cluny dibe cihê kar û karkerên jirêzê. 2 sal piştî vî şerî, rojekê, Athur Rimbaud, gedeyê 18 salî, şaîrê nûciwan û mêrmindal û bêhedan, bi Paul Verlain û jina wî re dikeve

nîqaşekê û ji mala wan derdikeve. Dûre berê xwe dide vê hotela biçûk. Qeyda xwe li odeya 62’yan çêdike û ji bo Ernest Delahayeyê hevalê xwe têbiniyeke wiha li def-tera xwe datîne û jê re dişîne:

“Lê belê niha odeyeke min a xweşik heye... Li vir, bi şev hima avê vedixwim. Çavê min bi serê sibehê nakeve, xew nakeve çavê min, bêhna min diçe. Aha ev e rewş.”

Diyar e êş û elema Parîsê û derd û kula Verlainê lê zor hatiye û xwe yekcar daye absentê. Rim-baud bi qasî meh û nîv li vê hotela biçûk dimîne. Di wê navberê de dost û hogirên wî jî tên serdanê. Min ji mêrikî pirsî “gelo yên diha-tin kî bûn, çiqas disekinîn?” Lê navê kesekî negot. Yan nedizanî yan jî nedixwest bêje. Mi go “gelo eşyayên wî mane qet an dikarim odeya wî bibînim?” Lê belê mêrikî destûr neda. Min jî israr nekir. Got, “Jixwe tişteke jê nemaye. Piştî wî, hotel gelek caran hatiye resto-rekirin.” Min di ber xwe de got belkî rojêke din, gava resepsio-nîst guherî, cardin vegerimê.

Hôtel Cluny, piştî Şerê Cîhanî yê Duyem ji bo xwendekarên ku ji welatên nepêşketî hatine dibe wargehek. Bi taybetî bûyerên 68’yî ku hima li zikê meydana Sorbon-neyê diqewime, şikl û şemala vê derê diguherîne. Di salên 1970’yî de jî Hôtel êdî dizivire ser hoteleke turîstîk û du stêrkên li xwe digire. Niha jî turîstên nîv-zengîn berê xwe didin vê derê.

Bi qamyonan tişt hene ku bên gotin derheqê vî şaîrê bi emrê xwe biçûk lê bi wezna xwe mezin de. Ji bo jînenîgariyeke tam-temam divê meriv tûrekê li pêşgotina “Bîrqên Direxşan (Illuminations)”a wî bigerîne ku ji hêla Ergîn Sertem ve par hatibû wergeran-



din. Xatirxwestina nivîsê jî bila ji vê ki-têbê be:

Demokrasî

Ala dikeve ser dimenê pîs î pelos, û devoka me difetisîne defê.

“Ber bi navendan, kî derê em ê bêhêvîtîrîn şiklê lêşfiroşiyê bigihînin. Em ê qir bikin şoreşên eqlî.

“Ber bi welatên bîberî û noqbûyî! -di xizmeta istismara sena’î û leşkerî ya herî hût-hêcane de.

“Bi xatirê te ev der, her dereke heyî. Leşkerên niyetpak, em ê bidin dû îlmekî çavsor; nezan di zanistê, rahatî li rihetiyê; bila bisikite din-yaya di gerr. Ev e meşa rast. Paş kevin, de, bimeş!”



Helim Barin

Dem û zindan

Her tişt di demekê de û li deverekê di-qewime. Dem û dever du têgeh in ku mirov her hewl dane ji wan fam bikin. Dem di efsane û mîtolojiyan de jî ciyên grîng ji xwe re peyda kiriye. Kro-nosê ku kurê Uranusî û bavê Zeusî ye, xwedayê demê ye. Kronosî dem afi-randiye û dikare di navbera demên cuda de biçe û were. Peyvên kronîk û kronolojiyê ji vir tên. Dîsa di mîtolojiya kurdan de bi navê Zervan, yezdanê demê heye. Li gorî zervanperestiyê hemû başî û xerabî ji demê afriye. Ma civak belheq dibêje “dem îlaca her tiştî ye”.

Her wiha gelek raman û teoriyên zanistê li ser mijarên dem û deverê hene. Arîstoteles ji bo demê dibêje encama tevgerê ye. Yanî tevger hebe dem jî heye. Her tevger bûyerek e. Pîvana demê bi tevgerê diyar dibe. Li gorî Arîstoteles, tevger di tiştên tamam-nebûyî de pêkan e. Xwedê, forma mikemel e; ew bêqisûr e û ji ber wê jî tevnagere. Ji ber tevnagere,

ew li derveyî dem û deverê ye lê tev-gerê jî ew dide destpêkirin û pê re jî dem dest pê dike. Li cihê tevger tune be dem jî tune. Bi rastî jî dema mirov li ser gihastina fêkiyekê dinêre yan jî li ser emrê xwe difikire, gotinên Arîsto-teles pir baş tên famkirin lê wekî pêşî-yan digot: “Heta xwe nas kir, emir xelas kir.” Her çi qas tamam-bûyîn (xwenaskirin) li qatên jor xwedatiyê îfade bike jî li ser zemîna jêr ew teqa-bulî mirinê ye. Fêkiyên gihastî tèn xwarin an jî wekî pelên zer hildiwesîn.

Yek ji wan fîlozofên ku li ser dem û deverê fikiriye Kant e. Kant van her du têgehên weke têgehên “a pîorî” bi nav kiriye. Yanî têgehên (sêwirîn) ku beriya cerebeyê hene ku di mirov de ji-xwe-ber weke teorîk hene. Têgehên bêcerebe an jî pêş-cerebe ne. Di her mirovî de wekî kategorîk hene. Ji bo tu dem û deverê têbigihîyî, hewceda-riya te bi zanînen bi cerebeyê bi dest xistî tune lê li gel vêya hemû cerebe di nav dem û deverekê da çêdibin. Têge-

hên ku bi cerabayê têdighê têgehên “a posterîorîyê” ne. Ji bo wan têge-hên “a posterîorî” divê têgehên dem û deverê hebin lê ji bo têgehên dem û deverê hewceyî bi ti cerebeyê tune.

Teoriyên zanistê demê bêtir bi dever û tevgerê şîrove dikin. Li gorî Teoriya Îzafiyetê (kuantum) dem li ciyên sekinandî û li ciyên bitevger di-guhere. Her wiha li fezayê bi awayekî din dixebite, li dinê bi awayekî din... Dem rehendeke subjektîf e. Xema Xeyyamî belkî tişteki din be lê wiha di-bêje: “Du rehendên demê hene: dirê-jahiya wê bi rojê re û stûrbûna wê jî bi azweriyê re eleqedar e.” Rast e karên ku em naxwazin bikin dixwazî bila sae-tek be jî bi me zor tê. Her ders çil deqe bû li dibistanê lê dersa tirkî xelas nedibû û dersa sporê te ha didî xelas dibû.

Helbet van şîroveyên fîlozofî û za-nistî li Kurdistanê bi awayekî din dixe-bitin. Di ferhenga mêtîngehiyê de dem û dever ji ferhengên din cudatir

in. Ji ber ku her hêzên mêtînger “ar-manca wan ew e ku dem û deverê bikin pariyên biçûk” û li şûna rastiyên wan sîmulasyona wan deynin. Çawa ku têkiliya erdnigarî û dîrokê xurt e; wiha têkiliya dem û deverê xurt e. Weke Helîm Yusivî di Sobartoya xwe da dibêje: “Welatê ku ji erebeya dî-rokê ket, cografya dev li guhê wî kir.” Li vir nivîskar silavek dide fîlozofîya Hegelî lê Hegel pêşiyê bi cografyayê dev li guhên welatên rojhilatî dikir û dûre van welatan ji erebeya dîrokê dadixist. Ji ber ku li gorî Hegelî li Roj-hilat fîlozofî tune. Yanî aqilê mutlaq ku jê re dibêje Geist li rojhilatê cîhanê negeriyaye. Li gor wî dîrok welatên bêfîlozofî nahewîne. Îcar em werin ser meseleya xwe. Çawa welat ji ere-beya dîrokê dikevin mirov jî ji erebeya demê dikevin û dever dev li guhê me dike. Li welatên dagirkirî ji ber wê dem bê qîmet e, ji ber ku dever bi reneqî din dev li guhê mirov dike. “Piştî du caran cezayê muebetê li

te birîn min êdî nema ji dema wan bawer kir.”*

Her ku li ser mijara dem û deverê difikirim, ji feza û teoriyên kuantumê bêtir zindan têne bîra min. Ma ew jî ne dinyayek din e! Gelo ev dema sub-jektîf ku li gorî cihan diguhere li zinda-nan çawa dibuhure? Saetekê li derve teqabulî çiqasî dike li zindanan? Belkî we jî dîtibe, li twitterê rupelek heye; Rojeva Zindanan (@RojevaZindanan). Ez wê dişopînim lê weke her tiştên medyaya civakî dibînî û dibuhurî lê hin tişt hene, bi qasî ku tu tiliya xwe bişemîtînî ewqasî hêsan nabihure. Li ser meseleyê tişteki wiha parve dike: “Teyfik Kalkan Ev nêzî 29 sal in li zindanê ye. Niha li zindana Tekîrdaxê ye. #GirtiyênSiyasîRûmetaMeNe” Em kesên ku ji ber koronayê 2 roj nikaribûn li mala xwe, xwe îzole bikin em ê çawa 29 salan îdrak bikin. Du roj wek du mehan dirêj dibûn... Lê 29 sal?

** From A To X / A Story In Letters, J. Berger*

Embazîya luye û şêrî

Turabî Kîşîn

Luye û şêrî benê embazê jubînî.
Benê embazê jubînî...
Luye vana “birawo şêr çend ser-
rîyo ma embazê jubînîme to pîzê mi
mird nêkerd.”

Şêr gêreno ra luye rê vano “Waka
luye to ayb kerd, bê ma şîme ez pîzê
to mird kerî.”

Nîyetê luye owo ke hem pîzê xo
mird bikera, hem zî sey şêrî nêçîrî bi-
musa.

Aye bimiso...
Danê raye şonê jû merge.
Şonê jû merge...
Ma vacîm mergê de zê Merga
Gola Devan. Qayt kenê merge de da-
vistê astor hawo çerenî. Amnanan
wayîran astorî verdayî ra merge.
Merge de çerenê. Bîyê mird û gird.
Xurtê yanê.

Şêr qaytê ju be ju astoran keno.
Ju astorî keno xo çim ra.

Keno xo çim ra...
Şono sarê merge êno hetê luye.
Luye ra vano “Waka luye dimê mi
bîyo rep.”

Luye qayt kena eya dimê şêrî bîyo
rep.

Vana “Eya birawo şêr dimê to
bîyo rep.”

Rêna şono sarê merge êno hetê
luye na defa vano “Waka luye pîrçê
pê vilê mi bîyo gij yan nê.”

Bîyo gij yan nê...
Luye qayt kena rastî cî pîrçê pê
vilê şêrî bîyo gij.

Vana “Eya bira şêr ville pîrçê pê
vilê to bîyo gij bîyo zê şimşêr.”

Bîyo zê şimşêr...
Şêr rê de bin şono sarê merge
êno û luye re vano “Waka luye di-
danê mi bi çîqî yan nê.”

Yan nê...
Luye qayt kena ke rastî cî didanê
şêrî bîyê çîqî. Vana “Eya bira şêr di-
danê to bîyê çîqî.”

Didanê to bîyê çîqî...
Şêr dolima peyêne şono sarê
merge êno hetê luye û vano “Waka
luye hela vace çimê mi bîyê sûre yan
nê.”

Bîyê sûre yan nê...
Luye qaytê urtê çimanê şêrî kena
ke çî qayt ko çimê şêrî bîyê zê gola
gonî. Gêrena ra şêrî vana “Eya bira
şêr çimê to bîyê zê gola gonî.”

Gola gonî...
Kêfê şêrî beno weş.
Beno weş...
Şêr luye ra vano “Waka luye o
west to nika mi sêr bike. Qayt ke ez
se kena.”

Se kena...
Şêr vaz dano şono xo erzeno serê
ju astorî û astorî dêmdano hard.
Dêmdano hard... Pîya nuşenê serê
beratê astorî ra û wenê.

Wenêêê rind pîzê xo ke kenê mird



danê raye şonê.
Danê raye şonê...
Raye de luye şêrî ra vana “Bira şêr
endî embazîya mi û to qedîyaye. Em-
bazîya mi û to hetanî îta bîye. Ez endi
nêçîre musawa, endî hewcê to niyo.”

Hewcê to nîyo...
Luya to dana raye şona. Şêr dima
luye qîreno vano “Waka luye zê to
niyo, henî meke, embazîya ma xirabe
meke. Ti nêşkîna zê mi nêçîrî bikerî,
bê meke, bê meşo.”

Bê meşo...
Şêr gêreno verê luye ra gêreno
serê luye ra ama bê faydîya.

Bê faydîya...
Luya to goş pa nêkena û dana
raye şona.

Dana raye şona...
Şona hetê kerguhî. Kerguhî ra
vana bê ma şîme ez pîzê to mird kerî.
Kerguhî gêna şona verê merge.

Luya to gêna şona verê merge...
Kerguhî ra vana ti îta babokê mi
vinde. Qarişê çiyê mebe.

Tabî luye merge de qaytê astoran
kena û ju astorî kena xo çim ra.

Luya to kena xo çim ra...
Luya to şona sarê merge êna hetê
kerguhî, kerguhî ra vana “Bira kerguh
dimê mi bîyo rep yan nê.”

Bîyo rep yan nê...
Kerguh qaytê dimê luye beno
tawa rep nêbîyo. Gêreno ra luye vano

“Nê wille waka luye tawa dimê to rep
nêbîyo.”

Rep nêbîyo...
Luye vana “Bira kerguh ti vace
bîyo rep.”

Kerguh xo rê mecbur maneno
vano “Eya waka luye dimê to bîyo
rep.”

Bîyo rep...

Luye rê de bîn dana raye şona
sarê merge û xo gijgijnena êna hetê
kerguhî vana “Bira kerguh rê qayt
bike pîrçê pê vilê mi bîyo gij yan nê-
bîyo gij.”

Nêbîyo gij...
Kerguh qayt keno tawa pîrçê pê
vilî gij nêbîyo, luye ra vano “Nê waka
luye tawa pîrçê pê vilê to gij nêbîyo.”

Gij nêbîyo...
Luye vana “Bira kerguh ti vace eya
bîyo gij.”

Keguh rêna mecbur maneno û
luye ra vano “Eya waka luye pîrçê pê
vilê to bîyo gij.”

Bîyo gij...
Luye rê de bin şona sarê merge
ena hetê kerguhî û vana “Bira kerguh
didanê mi bîyê çîqî yan nebîyê çîqî?”

Nêbîyê çîqî...
Kerguh qayt keno ke tawa didanî
midanî çîq nêbîyê. Rêna vano “Nê
wille waka luye tawa çîq nêbîyê.”

Çîq nêbîyê...
Luye rêna hêrs bena vana “Bira
kerguh to vace bîyê çîqî.”

Kerguh rêna bêçare maneno û
vano “Eya waka luye didanê to rind
bîyê çîqî.”

Didanê to rind bîyê çîqî...
Dolima peyêne şona sarê merge
êna hetê kerguhî û vana “Bira kerguh
hela vace çimê mi bîyê sûre yan nê.”

Bîyê sûre yan nê...
Kerguh qaytê urtê çimanê luye
keno tawa sûre nêbîyê. Vano “Nê
waka luye tawa sûre biyayene mi ra
nêyasena.”

Mi ra nêyasena...
Luye qîrena serê kerguhî û vana
“Ti vace eya bîyê sûre bîyê zê gola
gonî”

Bîyê zê gola gonî...

Kerguh rêna bêçare maneno û
vano “Eya waka luye çimê to bîyê
sûre bîyê zê gola gonî.”

Zê gola gonî...
Kerguh ke nîya vano kêfê luye
beno weş.

Beno weş...
Luye kerguhî ra vana “O west bira
kerguh ti nika mi sêr bike ez se kena.”

Ez se kena...
Luye vaz dana şona xo erzena
serê ju astorî ke astorî dêmdo hard.

Astor di çutman dano ver ra fekê luye
ra luye nêzana ci rê se bîyo.

Nêzana ci rê sebîyo...
Luye bayicîna, bena zê terrik û
dêmdîna urtê merge. Handê ke ru
teyro...

Handê ke ru teyro...
Kerguh êno serê beratê luye qayt
keno ke çî qayt biko, çimê luye bîyê
sûre bîyê zê gola gonî. Didanî bîyê
çîqî, dim hêlê ra şîyo, pîrç hêlê ra
şîyo.

Hêlê ra şîyo...
Kerguh luye ra vano “Waka luye
hîna teze ke çimê to bîyê sûrî, didanê
to bîyê çîqî, porê pê vilê to bîyo gij û
dimê to bîyo rep.

Bîyo rep...
Oxro ke şêrî hetanê o west pê ju
kemere de xo dano we û înan ro sêr
keno.

Sêr keno...
Wexto ke luye zê beratê dêmdîna
urtê merge o west, şêr pê kemere ra
vecîno êno.

Vecîno êno...
Êno serê beratê luye û vano
“Waka luye mi to ra va nîya meke em-
bazîya ma xirabe meke. To nêşkîna nê-
çîra şêran bikerî. Qaytê to goş nêda
serê mi, to dî peynîya to se bîyê”

Dewey Ma

Cemîl Oguz

cemilo@diyarname.com

Şar se keno, ma sekenê?

Ma eno hefte bawnin ka şar se keno,
ma sekenê. Vatişêke verînan ê kurdan
bîbî, vatê: "Ewca qasê qiney kerge çî-
niyo bawne sero danê pêro." Vatişêke
verînan o û meseleyke muhîm a. Verî
a joy me dinya ra çende hikayan
pêşkêş bikerin.

NASA aşme de awe vîna

NASA saziyeke DYA (Dewletê Yew-
biyîn ê Amerîka) wa û serê feza de xe-
bate kena. NASA xebere da û vat ke
roco dişeme, yanê roco 26.10.2020 de
xeberêke weşe ma go bidê. Ew roj
hame, NASA va, "Ma reya yewîne serê
riyê erdê aşme de cemed vînawo."
Yanê aw vînawa. Heta enka xeberêke
anayîne nêbîbî. Û cawgir aw bibo ew
ca jîyan/heyat esto, yan zî go bibo.
Belkî rocê ke aşme de zî însanî jiyane
bikerê, ka zano?!

Venus de nîşaney heyatî

Venus zî zey dinya gireestereykewo.
Belkî ewca zî jiyane bibo? Ma çî zanê?
La enka îdîay ke anayîna esta. Ajansê
rus Sputnikî xeberêke kerde vila. Xe-
bere de vat ke zanyare Arijita Manna ke
Koleja Midnapur de kar kena û vat ke
ay serê Venusî de xebate kerda û ana
dewam kerd: “Ay, Venus de îşaretê ke
jiyane esta vînawo.” Helbet hema sera
se niyo, la ana heyseno ke go ene xe-
bate dewam bikera. Belkî ewca zî mer-
dimê ma bibê, kam zano?!

SPACE X

SPACE X zî DYA de sazîke taybet a.
Emsar aşmey gulânî de ay di merdimî
berdî feza. Sazî wazena merdîman zey
tûrîstan bero û biyaro.

Fosîlo 70 mîlyon sere

Eyaletê La Rioja yê Arjantînî de
bermayiyê dînozan ê dîrokey cay
şina heta 70 mîlyon serre verî hame
dîyîşî. Walîyê Eyaletê La Rioja ê bi
namey Ricardo Quintela serê hesabê
xo yê twitterê ra nişt. Ê va ke herêmey
Santa Domingo yê bajarê Vînchina de
fosîlê dînozorî ke dîrokey cê şina heta
70 mîlyon serre bi xebatey henî zanya-
ran hame dîyîşî. Keynê enî, Îlîs berma-
hiyê hakanê dînozan zî hamew
dîyîşî. Eno 5 serrî yo serê ene joy de
xebatenê kenê.

Meselay ma

Ma enka bêrê serê meselay xo. De-
wican zehf dayne pêro. Zehf reyan to
hawnaney qey çîyo nê çî zî dayne pêro û
jobînan kîştêne. Re rey serê bincewê ke
erd de zî çende tenî hamey kîştîşî. Tam a
çaxî pîlan vatêne, "Ewca qasê qiney
kerge çinî yo bawne sero danê pêro."

Jiyaney kurdan bi pêrodayîş dewam
kerd. Her ana bî. Qe nêşkay pîl bifikiriyê
û loma her di binê linganê bergîranê
xerîban de merdê. Enka zî parçey Ba-
şûrî de di partî qeybî caykew qasê
qiney kergewo hame qarşî/hemberê jo-
bînî. Go seyîn bo, go seyîna birakujî vira-
zîyo yan nê, ez nêzana. La eno vatişê
verînan hame vîrê mi. Vatişêkew bîn zî,
"Şar şî aşme, şima hema serê çiyê nêçî
de danê pêro."

Yê nimûney joyînî ma qeybî ene joy
dayê. Şar şîyo aşme, şîyo feza, şar serê
dîrokey mîlyonan serre ra lêkolîne
keno la ma?

Qezayê trafîkî de kesêk merd la îfadeyê qeymaqamî daxî nêgêrîya

Merkezê Xeberan

Qeymaqamê qezaya Çemizgezекî ya
Dêrsimî Mehmet Guder 6 rojî verê cû
pê wesayîtê xo da hemwelatîyê bi na-
meyê Murat Atliyî ro. Atliyî dinyaya xo
bedilnaye û la îfadeyê Guderî zî nêame
girewtene

Qeymaqamê qezaya Çemizgezекî
ya Dêrsimî Mehmet Guder 6 rojî verê

cû pê wesayîtê xo da hemwelatîyê bi
nameyê Murat Atli. Murat Atliyo ke xe-
batkarê Şaredarîya Xarpêtî bi, nêweş-
xane de dinyaya xo bedilnaye. Heta
nika îfadeyê Guderî nêame girewtene.

Goreyê raporê qezayê trafîkî
Murat Atli 'sûcdar' bi û yew xeletê
Mehmet Guderî çin o.



Şahîdanê ke embazanê karî yê At-
liyî yê, vera mesele nêrazîbîyayîşê xo
mojna. Goreyê şahîdan serebût wîna

qewimîya: "Wexto ke ma derbazê
kişta bine ya rayîrî bîyêne wesayît gîna
embazê ma Atli ro. Sereyê embazê
ma şikîya. Embazê ma zewijnaye û
wayîrê domanan ê qijan bi.

Ma dima musayî ke wayîrê ê
wesayîtî qeymaqam o. Peyê
înan de walî, çapemenîye,
şaredarîye, edlîye estê. Qey-
maqam serbest o û qeza
roja şemeyî qewimîya û o

roja dişemeyî agêra karê xo. Ganî heta
ke cigêrayîşê serebûtî bêro temam-
kerdene qeymaqam nezaret de bi-
mendêne. Na bêwayîrî ya."





Lê ku bêjin tu jî deve yî!

Li hêla Qerejdaxê dibêjin ku fermana deveyan derketiye. Hemî deve li hev dicivin û biryara koçberiyê didin. Di nivê şevê de deve ji Qerejdaxê bi rê dikevin, wê herin Binxetê û li wê derê bi cih bibin. Hinekî dimeşin, lê dinihêrin ku waye roviyek jî li pey wan e û tê.

Deve li benda rovî dimînin. Rovî jî tê li ber wan disekine.

Deve ji Rovî dipirsin û dibêjin: “Birayê Rovî, li me hal e lê te çi hewal e?”

Rovî bi keser bersiva wan dide û dibêje; “Birakno wekî ku hûn jî dizanin ev der Tirkiye ye. Li vî welatî hed û hesabê bêbextiyê jî nîn ne. Niha ku yek derkeve û bibêje tu jî deve yî, de kanê ez ê wê demê çi xwelî li serê xwe bikim. Ez bi serê bavê we bikim, heta ku bawer bikin ez ne deve me, wê temenê min xelas bibe. Loma min ji xwe re got a baş ez jî bi deveyan re birevim.”

Riza Uyar


Tiştanok (mamik)

Dîsa em dixwazin hin tiştanokên nû bi we hêjayan re parvekin. Em hêvî dikin ku li gorî dilê we bin.

Kî dizane ev çi ye?

- 1- Sê tişt di ser pirê re derbas bûn. Yek ji wan pir dibîne û pêl dikê û derbas

- dibe; yek dibîne û pêl nakê lê ew jî derbas dibe; yê din ne dibîne û ne pêl dikê lê derbas dibe.
- 2- Kumikê xezala gindirî newala.
- 3- Apê sincik bazda quncik.
- 4- Biharan bûk e, havînan sûk e, zivistanan pepûk e.



Bersivên me ev in:

- 4-Dara fêkiyê.
- 3-Mîşk.
- tûmîkê botavê.
- 2-Têştî an jî ser milê wê ye.
- canî ye û zarokê li 1-Dayikeke du-

Zûgotinok

Vê carê jî em ê çend zûgotinokên nû ji we xwînerên hêja re bêjin. Bi hêvî me, dê û bav li malê kêlîkekê telefonên xwe bidin aliyekî û di nav malbatê de ji hev û ji zarokên xwe van zûgotinokan bipirsin.


→ Gelo kî dikare 3 caran li ser hev bêje: **Şîv kundir, paşîv kundir, ez a rindtir naxwim kundir.**

→ Heke nikaribî wê bêjî, ka vê biceribîne: **Rovî li rê livî, rê li rovî livî.**

→ Heke ew jî nebû dê ji sedî sed ev çêbibe: **Heşt hirc, her heşt hirc jî pişt bi pirc.**



XAÇEPIRS



JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ

- 1. Heywaneke bejî ku hem di avê de hem li bejahiyê dijî 3. Raz
- 5. Cot, du zarokên ku bi hev re ji dayik dibin 6. Paytexta Îtalyayê 7. Ne cot, ne zo
- 9. Awayekî çêkirina goştê biraştî, li Sêrtê bi nav û deng e
- 12. Remezan, yek ji şertên îslamê 14. Germahiya laşê mirov
- 15. Bajarekî rojhilatê Kurdistanê 17. Sewalekî ku berê pê cot dikirin
- 18. Ji bo, Ji bona 22. Tevlêbûn

JI JOR BER BI JÊR

- 1. Tiştê tê hilgirtin 2. Esmer, reş
- 3. Reşahiya mirov a ji ber tavê çêdibe, ew der ne tav e
- 4. Noteyeke muzîkê 5. Alava ku dan tê de tê kutan 7. Bi ba ket û bilind bû 8. Rok, tav
- 10. Kurtenivîsa Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (bi îngilîzî)
- 11. Navê mehekê
- 13. Dîtina tişteki nû, afirandina tişteki nû
- 14. Navê çemê Dicleyê, her wiha paşnavê nivîskarekî kurd
- 16. Destvekirî, comerd
- 19. Zeviya tê avdan, ne bejî
- 20. Kevir
- 21. Noteyeke muzîkê
- 23. Erd, xwelî

Bersiva heftaya borî



Serpêhatiya dengbêj û muzîkjenekî hîp hopê

■ Bêrivan Kayi

Tê zanîn ku çanda dengbêjiyê tenê strîn an jî xweşbûna dangan nîn e. Ev çand li Kurdistanê çandeke qedîm e û bi saya stranên dengbêjan roja me ya îro çand û dîroka kurdan tînê danasîn û bi vî awayî belav dibe. Ji Evdalê Zeynikê heta Meryemxan û Şakiro, degbêjî ji bo çanda kurdî bûye çavkanî. Gelek dengbêj jî hene ku her çiqas navên wan zêde belav nebûbe jî bi stranên xwe dîroka qedîm li ser piyan hiştine.

Dengbêj Feqî Mele Îsmail jî yek ji wan kesan e ku hema bêje jiyana xwe tev bi dengbêjiyê derbas kiriye. Erê feqe ye, mele ye lê tu carî ev yek jê re ne-bûye asteng ku ew bi qîrîn stranên xwe bêje û tev li şevbihêrkan bibe.

Meleyek dibe dengbêj

Mele Îsmail di sala 1926'an de di dayik dibe û perwerdeya xwe ya ewil li ber destê bavê xwe digire û pişt re jî li Panosê li ba seydayê Mele Zahir û Mele Hesên perwerdeya xwe ya yekem xelas



Ez dixwazim ji we re qala dengbêjekî bikim ku zêde navê wî nehatiye bîhistin. Pişt re jî em ê berê xwe bidin çîroka ciwanekî ku bi çanda dengbêjiyê mezin bûye û karê xwe yê muzîkê li ser vê çandê dike

dike. Tê zanîn wan deman çandeke kevnar e; piştî perwerdeyê hewce ye agahî tenê di tûrên wan de nemînin û bi ci-vakê re werin parvekirin. Mele Îsmail êdî bi hin hevalên xwe yê din re berê xwe dide herêma Botan, Amed û başûr û rojavayê welêt û bi vî awayî perwerdeya xwe ya ilmî xelas dike û dest bi perwerdeya zimanên kurdî, erebî û tirkî dike. Pêşî diçe Mûşê û di nav 30 salan de li gelek bajarên serhedê hem mele-tiyê dike hem jî wek dengbêjekî tev li şahî, dîlan û şevbihêrkan dibe.

Bi dengbêj Şakiro re...

Dengbêj û Feqî Mele Îsmailê Agirî êdî bi dengbêjên mîna Şakiro, Reso, Zahir, Tahir, Bekirê Îdirê, Hecî Celaled-dînê Babiya, Mistefayê Cangoranê, Fe-qiyê Kizkapanê û bi gelek dengbêjên Serhedê re di şevbihêrkan de strandiye. Heta li gorî gotina malbatê di şevbihêrkekê de dengbêj Şakiro û Mele Îsmail li Panosê he-rêma Dermo sê roj û sê şevan bi hev re strîne.

Mele Îsmail dema di 2013'an de diçe ber dilovaniya xwe, li pey xwe stranên mîna 'Şerê li ser tepê Qersê', 'Çîroka Lalixana Spartî', 'Evdîlmeçîdê Sipkî', 'Çemê Sînanê yê Bismilê', 'Eliyê Ūnis', 'Qewmê Çiya', 'Xelefê şekir', 'Emînê Ehmed', 'Emê Gozê', 'Klama Silêmanê Faro û Bavê Kazim siwarê alaya girê tendurekê' hiştine. Tevî van stranên jî em dikarin bêjin ku stranên wî yê di nav gel de tînan nasîn ev in: 'Asê Mûso', 'Selîmo lawo', 'Bedewê û Lo mîro'.

Dengbêjî û stranên hîp hopê

Li ser vê mîrateya dengbêjiya Mele Îsmail, îro jî neviyê wî Bestamî Tanîş (28) bi navê xwe yê din Agirbest dest bi muzîkê kiriye û awayê muzîka rapê (hîp hop) bi kar tîne.

Neviyê Mele Îsmail Bestamî Tanîş ji zaroktiya xwe ve, di nav çand û kevnepopiya dengbêjiyê de mezin bûye û ji bo vê yekê jî dengbêjî jê re bûye bingehek xurt. Li ser vê bingehe awayê muzîka Rapê ya di salên 1960-1970'yî de ji getoyên Amerîkayê belavî hemû cîhanê dibe, dest bi karê muzîkê dike.

Agirbest der barê tîkiliya di navbera dengbêjî û muzîka rapê de diyar dike ku her çiqas haya her du çandan ji hevdu tune be jî bi serdemên nêzî hev derketine û wiha dibêje: "Rêka min a ewil dengbêjiya Feqî Mele Îsmail bû û ya duduyan jî rap e. Ez di her du awayan de bingeheke hevpar dibînim. Her du jî ji bo gotina derd û kulan, xweifadekirin, êş û kêfa evînê, rexnerîna pergalê, zilma li ser gelên hatine bindestkirin û hwd tînin ziman. Ya din jî hem dengbêjî hem jî rap her du jî bi awayê axaftineke li ser hevdu (bi lez) tînin gotin. Tişt a teqez ew e ku çanda dengbêjiyê çandeke kevnartir e lê mixabin li cîhanê wek a rapê nayê nasîn."

Zimanê dayikê...

Agirbest di stranên xwe de bi zimanekî tund kurdên ku dev ji zimanê xwe berdidin rexne dike. Di strana bi navê 'zîman' de bang li kurdên ku 'li ser navê populîzmê ji zimanê xwe fedî dikin' dike



û ev tişt tîne ziman: "Ez bawer im ku dê muzîk gelek tiştan biguhezîne û buguhe-rîne. Îro di nav kurdan de kîjan awayê muzîkê hebe baş e lê ya girîng ew e ku em bala ciwanan ne tenê bi awayên pop, rock, rapê tevî vana bi çand û zîmanê dayika xwe jî balê bikişînin û li gorî vê yekê tevbigerin."

Tundiya li ser jinan tîne ziman

Muzîkjenê rapê Agirbest di strana xwe ya bi navê 'min nekuje'yê de balê dikişîne ser tundiya ku ji aliyê hişmendiyê serdest ve li jinan tê kirin û wiha dibêje: "Em di sedsalake wisa de ne ku hê jî tundiya li ser jinê berdewam e. Mixabin her roj jin tînin qetilkirin û ev rewş xirabtir dibe. Ji bo vê yekê jî ez bi strana xwe, li hember vê hişmendiyê derdik-evim û dibêjim ku jin bixwaze dê dika-ribe gelek tiştan bike."

Hejmara 8'an a Zrîngê derket


Hejmara 8'an a kovara Zrîngê ya karîkatûr û qerf û henekan bi hejmareke nû gi-hîşt ber destê xwînerên xwe.

Kovare di berga xwe de bi boneya 25'ê Mijdarê Roja Têkoşina li Dijî Tundiya li Jinan, bal kişandiye ser tekoşîna jinan a li hemberî tundiyê. Kovar dîsa bi tevlê-bûna nivîskar û xêzkarên xwe gelek mija-rên di rojevê de bi rengekî qerf û henekî aniye ziman.

Di vê hejmarê de nivîsên Azad Kutî, Şêx Zubêr, Ikram Balekanî, Ozgur Amed û Mem Aliyê Kamûr cih digirin.

Her wiha xêzkarên vê hejmarê jî ev in: Mustafa

Yaman, Mehmet Erbey, Zehra Dogan, Bunyamîn Karakoç, Michael Erdman, Kubilay Odabaş, Siyaland, Hebûn, Rûşen Sabîlî û Eşref Mumcu. **AMED**



'Erdnîgariya Kurdistanê-1' derket

|| Navenda Nûçeyan

Weqfa Îsmail Beşikçi di daxuyaniyekê berhema Abdurrahman Onen ya bi navê "Erdnîgariya Kurdistanê – I: AGIRÎ" da nasîn û her wiha der barê xebatên Onen ên din jî agahî bi raya giştî re parve kirin. Weqfa Îsmail Beşikçi di daxuyaniya xwe de dibêje ku dê ji bilî vê pirtûkê xebatên din ên Onen ên der barê erdnîgariya bajarên Wan, Bedlîs, Çewlîg, Mêrdîn û Amedê de jî bînin çapkirin.

Di vê pirtûkê de navên mezre, gund û navçeyên Agirî yê tirkî û kurdî cih digirin; her wiha navên çem, gol, çiya û deşt û zozanên Agiriyê. Ji aliyekî din ve nexşeyên fîzîkî yê erdnîgariya Agiriyê; hejmara nîfûsa navend, navçe, gund û mezreyên Agiriyê; wêneyên erdnîgarî û gelek cihên Agiriyê jî di pirtûkê de hatine bicîhkirin.

Nivîskar Abdurrahman Onen, di

encama xebata xwe gelek salan de, derheqê erdnîgariya kurdan de gelek agahiyên hejîa berhev kirine. Onen demeke dirêj e, herêm bi hêrêm li bajar, navçe, gund û mezreyan digere, li ser cihê diçiyê, kite bi kite nav û agahiyên der barê erdnîgariyê de bi dest dixê û qeyd dike.


Onen hetanî niha der barê erdnîgariya gelek bajarên kurdan de bi tîra xwe agahî dane hev. Wî ne tenê navên kurdî yê cih û waran kom kirine, di heman demê de nexşeyên hemû bajar, navçe û herê-mên muhîm derxistine. Tişt a xebata mamoste bi qîmettir dike jî ev e: Ev berhema ku pirtûka yekem a rêzepirtûkên "Erdnîgariya Kurdistanê" ye, parçeyek ji vê xebatê ye.

Bajarê Agiriyê ji hêla erdnîgariyê xwe ve cihek zaf dewlemend û berfireh e. Çiyayên Agirî, Tendûrek, Sîpan, Eledax, Kosedax, Çemê Mûradê û gelek cihên din...

Abdurrahman Onen ji navçeya

Dêrika Çiyayê Mazî ya Mêrdînê ye. Di sala 1956'an de hatiye dinê. Dibistana seretayî û navendî li Dêrikê, ya amadeyî (lîse) li Mêrdînê û zanîngehê li Stenbolê xwendiyê.

Ji sala 2013'an ve gera xwe ya li Kurdistanê didomîne. Ji xeynî vê pirtûkê, pirtûkên wî yê li ser erdnîgariya Wan, Bedlîs, Çewlîg, Mêrdîn û Amedê jî ji bo çapê amade ne.



Xêzeromana zarokan GOG tê amadekirin

Berê hin kovarên zarokan ên bi kurdî hebûn lê heta niha xêzeroman bi kurdî nehatibûn derxistin.

Karîkaturîstê kurd Îmam Cîcî amadekariya xêzeromaneke kurdî ya ji bo zarokan dike. Îmam Cîcî karîkaturîst e û zêdetir 25 sal in ku xêz dike lê raya giştî ya kurd ew bêtir bi kovara Pîne û Zrîngê nas kir.

Cîcî niha dixwaze ji bo zarokên kurd tiştêkî din bike: Derxistina kovara xêzeroraman. Ji bo vê yekê bi malpera fongogo.com'ê kampanyaya piştgiriye daye destpêkirin.

Îmam Cîcî ku berê bi xêzkariya xwe ya bi kovara Pîne û paşê jî Zrîngê hat nasîn ji bo vê projeya xwe ya nû dibêje ku dê zimanê vê kovarê kurmançî û kirmanckî be û wiha didomîne: "Çapkîrîna kovarekê gelek zehmet e.

Ev pereyên bîst ser hev ji bo telifê ez ê bi kar bînim û wekî kovareke dijital dest pê bikim. Ger derfet çêbibin wê çaxê em ê derbasî çapa kaxiz bibin."

Derbarê vê xebatê de Xêzkar Cîcî diyar dike ku di kovarê de dê karakterên biyanî yê wekî Lucky Luke, Yakari, Thorgal û Milo hebin. Xêzkarên kurd ên wekî Dogan Guzel û Ender Ozkahraman jî dê ji bo kovarê xêz bikin.

Cîcî di dawiya axaftina xwe de wiha dibêje: "Li dinyayê gelek xêzên navdar ku ji bo 20 zimanan hatine wergerandin hene lê ew bi kurdî nehatine weşandin. Ez dixwazim wan bi kurdî biweşînim. Di qada navneteweyî de dixwazim zarokên kurdan bi wan çandan re bînim ba hev." **STENBOL**



Şanoya Bajêr a Amedê perdeya xwe vedike

Şanoya Bajêr a Amedê, amadekarî dike ku bi lîstîka "Bêrû" ya nivîskarê îtalyan Darîo Fo ya ji aliyê qeymeqamiya Gazî-osmanpaşayê ve hatibû qedexekirin, perdeya serdema nû vebike. Şanoya Bajêr a Amedê, wê bi lîstîka 'Hema Hema Jin: Elizabeth' a Darîo Fo perdeyên xwe vebike.

Şanoyê her wiha bernamêya xwe ya serdema nû ya lîstîkên meha mijdarê jî aşkare kir. Li gorî bernamêyê; wê tevahiya meha mijdarê lîstîka "Hema Hema Jin: Elizabeth" a Darîo Fo û lîstîka "Xwezgînî" ya Şaliko Bêkes bînin lîstin. Lîstîka ewil wê 6'ê mijdarê li dika şanoyê ya nû ya li Diclekentê bi tevdir û bergiriyên vîrûsa koronayê ji bo hezkiriyên şanoya kurdî bê pêşkêşkirin. **AMED**



Ardîn Dîren

DOSYA

Qewmê li pey azadî, nasname û zimanê xwe; amazîgh ango berberî-3



Gelek hêzên serdest hatin û çûn lê amazîgh man

Gelek bahoz û bablîsokên “zer” hatine bi ser wan de. Wek civak di neqebên dijwar re derbas bûne. Ji ereban bigire heta roman, ji îspany-oliyan heta osmanîyan û heta digi-hîje fransîziyan bi ser axa mexrîbê ango berberîyan de girtin. Bi salan di bin zilma wan de jîyan. Ew hemû hatin û çûn lê amazîgh man cih û warê xwe qet neterikandin. Ew tim li wir man, li hember dagirkirina îspanyolan, osmanî û fransîziyan li

ber xwe dan û şer kirin. Li Mexrîbê di hemû êrîşên mêtîngeran de kesên cara pêşî bertek nîşan dane û serî rakirine amazîgh in. Her ku dagirker zora wan birine, ji bo dikaribin azad bişî ber bi çiyayan ve hilkişiyane û ji xwe re li serê çiyayên Cûrcûna û Barbarosê -ku du çiyayên navdar ên Berberîyan e- jiyaneke azad afirandin. Ji ber ku dagirkeran her tim ew aciz dikirin, ji bo bacê ji wan bistînin û zarokên

wan asîmîle bikin êrîşê wan dikirin lê berberî jî ji bo ev yek pêk neyê xwe ji pergala wan, fermiyet û burokrasiya wan dûr girtin û li çiyê jîyan. An na ew ê li hember dagirkeran nikaribûna bi salan hebûna xwe biparêzin. Ji ber van sedeman her ku ketine tengasiyê hilkişiyane ber bi çiyayan; çiya bûne stargehên wan û ew parastine ji dagirkerên zikreş. Bi saya çiyayan dirok, çand û zimanê xwe parastine.

Gava mirov li Cezayîrê çav bi bajarên amazîghan dikeve, navendek naxuyê. Ji ber ku malên wan li serê çiyayan û li hawirdorê bajêr belav bûne. Her yek bi serê xwe tevgeriyaye û ji xwe re li gor dilê xwe di nav daristanê de malek çêkirîye. Ev ne tiştekî ji rêzê bû. Li pişt vî dîmenî çîrok û sosyolojiyek hebû. Nêrîna wan û têkoşîna wan ya li hember ‘navendan’ jî ez bawer im ji vir tê û çîrokek kevn e. Amazîgh ê bi zimanê wan yê zikmakî tê wateya ‘mîrovên azad’, serxwebûna xwe di hemû gavan de diparêzin.

Li dinyayê hin qewm hene ji ber çav-sorî û zikreşîya mirovan, jenosîd û bişaf-tina dagirkeran her tim mecbûr mane ku xwe biparêzin û li ber xwe bidin. Her çiqas zordest xwestibin ew tune bibin jî wan dîsa li hember zemanên bêbext û êrîşên zordestan ji xwe re rêyekê peyda kiriye, tune nebûne û heya îro hatine. Yek ji wan qewmên ku di van zemanên bêbext re derbas bûye û serî li ber zordestan netewandîye û heya îro hatiye amazîgh in. Her tim wek mirovên azad jiyane û tu carî dev ji vê taybetmendiya xwe bernedane. Bêguman li dinyayê ew zêdetir bi vê taybetmendiya xwe tîn nasîn. Amazîgh, mirovên azad ên çol û çiyayan in.

Niştecihên mexrîbê

Li gor lêkolînên zanistî amazîgh 2 hezar sal Beriya Zayînê (B.Z) ji Asyaya Navîn koç kirine, di ber Behra Spî re derbasî bakurê Afrîkayê bûne û li wir bi cih bûne. Bakurê Afrîkayê ku wek Mexrîbê jî tê zanîn, bûye stargeh ji bo amazîghan û mirov dikare bibêje ku ew bi salan e li ser axa Berberîstanê wek niştecihên mexrîbê jiyane û çandeke qedîm ava kirine. Helbet ber bi çolê ango sehayê jî çûne û li wir jî hejmareke mezin a amazîghan heye. Her çiqas dinya wan bi navê berberî nas bike jî ew ji xwe re bi zimanê xwe dibê-jin amazîgh.

Bedelên giran dan

Li Cezayîr, Fas, Tunus, Lîbya, Nîjerya û Maliyê bi milyonan berberî dişî. Berberî tu car nebûne xwedî komarek serbixwe û li nav hemû komarên ku berberî li wan dişî, ew wek xetereyek mezin hatine dîtin û mafên wan ên bingehîn hatine bînpêkirin. Ziman û çanda wan di fermiyetê de zû bi zû nehatiye pejirandin. Ji bo vê yekê bedelên giran dane û hê jî li gelek welatan vê bedelê didin. Ji bo çand û ziman û mafên xwe yên mirovî li ber xwe didin û serê xwe li ber zordestan natewînin. Tiştê xerîb ew

e ku ew bi van welatan re li hember mêtîngerên van welatan bi hev re şer kirine û heya rizgariya wan pêk hatiye jî ew bi piştgirî û hêza xwe li ba van welatan cih girtine û dev ji biratiya wan bernedane. Çi tiştekî sosret e ku piştî rizgariya van welatan, hêzên desthilat-dar ên nû ku berê wek birayê wan tev-digeriyane yek bi yek dev ji biratiya berberîyan berdane. Hebûna wan, çand û zimanê wan înkâr kirin.

Berovajiyê vê, xwestin ku ew jî bibin ereb û li gor dîne îslamê tevbigerin; xwestin netewe-dewletan ava bikin û tenê dînek, tenê netewek, tenê ziman û alek hebe. Bi van politîkayên nijadpe-rest xwestin ku hemû berberî wek wan bişî. Ji lewre pîvana sereke ya jiyana berberîyan azadî bû. Ji ber van sedeman, li hev nekirin û nakin jî. Berberî îro dîsa li hember van welatan têdikoşin û dixwazin dengê wan li darê dinê were bihîstin. Ew li pey azadî, ziman û nasnameya xwe ne.

Netewe-dewletbûnê napejirînin

Li cem amazîghan bêguman mer-vatî ango xizmatî jî girîng e û ev taybet-mendiyeke wan a kevn e. Ji berê de xwedî êl û eşîr in û ew van êl û eşîrên xwe bi awakî demokratîk bi saya rûspi-

yan bi rê ve birine. Loma jî nêrîna netewe-dewletbûnê napejirînin û vê pergale dîrî xwe dibînin. Ew di vê baweriyê de ne ku nasnameya civakan bi saya bawerî, dirok û zimanên hevpar dikarin xurttir bibin. Li Mexrîbê pergala qebîletiyê zêde li pêş e û di hundirê xwe de nêzî pergala sosyalîzmê ye ku li ser hevparî û demokratîkbûnê disekine û zû bi zû mafên êl û eşîran nayê ecî-qandin. Ev yek jî ji bo amazîghan xaleke girîng e û vê çanda xwe îro jî diparêzin.

Gelek çalakî li dar xistin

Amazîgh li Fasê, ji bo ziman û çanda wan were naskirin bi salan e li ber xwe didin. Komeleya bi navê Tillellî, di salên 1990’î de pir çalak e û ji bo ziman û çanda amazîghan di fermiyetê de were pejirandin gelek xwepêşandan û çalakî-yan li dar xistine di wan deman de. Destpêkê bertekên Fasê pir tund bûne û êrîşî wan kirine, heya ku gelek kesan bîncav dikin û wan dikin girtîgehê jî. Bi demê re nêrîna dewletê diguhere, kesên di girtîgehê de ne derdikevin û herî dawî dewlet mecbûr dimîne ku di sala 2011’an de zimanê tamazîght ê amazîghan wek zimanekî neteweyî nas bike. Bi vî awayî zimanê tamazîght di destûra bingehîn de cih girt.

Amazîghên li Malî û Nîjeryayê

Li Nîjerya û Maliyê jî bedxwedana amazîghan navdar e lê amazîghên li çolê dişî bi navek dîtir tîn naskirin. Ji wan re tuareg tê gotin ku ew jî bi zamanê wan tê wateya “mîrovên birû-me”. Di têkoşîna wan de mirov tê derdixê ku ew jî dil jî xwedî rûmet in. Ji lewre ew jî li hember navenda dewletên wek Nîjerya û Maliyê bi rêxistinên çekdarî têdikoşin û serê gerîla dikin. Di navbera wan û komarê de bi dehan caran peyman hatin îmzekirin lê ji ber ku daxwazên wan ne li gor bîrdoziya “netewe-dewlet”ê bû perlemento tu car peymanan erê nekir û aloziya di navbera wan de bi salan e berdewam e. Li Nîjerya û Maliyê jî mixabin “Fransiyên Herêmî” xwedî hêz in û biratiya tuaregan napejirînin. Ziman, çand û hebûna wan tune dihesibînin lê ew jî li ber wan serî natewînin û bi şewazên cuda rêxistinên xwe xurt dikin û li hember “Fransiyên Herêmî” têdikoşin. Li her du dewletan jî nêzîkatiya desthilatdaran ew e ku tuaregan bixapînin û mafê wan bi wan bidin jibîrkirin. Vê yekê bi awakî qirêj dikin û ji hêzên derve pişt-giriyê digirin. Ev welat her çiqas wek sembolîk rizgar bûne jî mirov bi hêsanî dikare bibêje ku van welatan dîsa mêtînger bi rê ve dibin û ew girêdayî navenda mêtîngeran in.

Wek ku me li jorê jî anî ziman, li hemû welatên mexrîbî bi şewazên cuda



Rêgeza yekemîn ziman e

Mohammed Chtatou ku yek ji wan zanyarên çand û siyaseta Rojhilata Navîn e, diyar dike ku sê rêgezên bingehîn ên amazîghan hene. Ev her sê mijar ji bo wan pir girîng in û ew van rêgezên xwe tu car bînpê nakin. Wiha dibêje Chtatou: “Rêgeza yekemîn ziman e, ya duyemîn pergala demokratîk a êl û eşîrtiyê û ya sêyemîn jî tîkiliya wan a bi axê re ye. Ev her sê rêgez nasnameya wan diyar dikin.” Zimanê amazîghan bi tamazîghtî li dinyayê tê zanîn. Nêzî çil milyon mirov bi vî zimanî diaxivin. Zimanê tamazîghtî xwediyê gelek zar-avayan e û tîra xwe dewlemend e. Civakên amazîghî, dirok û rabirdûya xwe bi saya ziman li piya hiştine û ji bo ev ziman tîk neçe zêde li ber xwe dane. Bi taybetî kal û pîrên wan ji bo pêşerojê peywireke pîroz hilgirtine ser milê xwe û bi saya çanda devkî çand û zî-manê xwe parastine û ji nîfşên ciwan re bi rêya muzîk û deng-bêjiyê û her wiha bi saya çirokbêjiyê çanda xwe ya qedîm her tim vejandine.

Li hember êrîş û bişaftînen salan ên mêtîngeran ev ziman nehatiye jibîrkirin û di encama bedel û têkoşîna mezin de, sala 2011’an li Fasê û sala 2016’an jî li Cezayîrê zimanê wan bi fermî hatine naskirin. Ev yek cehda amazîghan a ji bo zimanê wan nîşan dide. Her çiqas bi awayekî sembolîk be jî îro ev ziman di fermiyetê de hene û tîn bikaranîn.

amazîgh li ber xwe didin lê tu welat wek Cezayîrê nîn e. Ji lewre hejmara amazîghan li vî welatî gelek e. Dirok, berxwedan û serpêhatiyên wan ên li vî welatî hêjayî nivîsandinê ne. Ji ber van sedeman ez ê bêtir qala amazîghên Cezayîrê bikim û nivîsa xwe wiha bi dawî bikim... (*didome*)

Amazîgh bi dil û can girêdayî axa xwe ne

Tevî van rêgezan tiştê herî girîngtir ew e ku amazîgh bi dil û canê xwe girêdayî axa xwe ne û dixwazin li ser axa xwe azad bişî. Chtatou, derbarê girêdana axê ya amazîghan de wiha dibêje: “Ji bo berberîyan ‘welat’ berî her tiştî ye. Têkiliyek wan a manewî bi axa wan re heye.

Ev ax ango welat tenê ne ji bo jiyana xwe lê bidomînin, di heman demê de warê wan ew cihê pîroz e ku wan ji hêzên mêtînger diparêze û nahêle tune bibin.” Têkiliya wan a bi ax û welatê wan re pergaleke wekhevîyê jî saz kiriye di encamê de. Ji bo wan navend ax e û her tişt

li gor vê axê diyar dibe. Hêz, desthilatî û otorîte li gor mirovan û asta wan saz nebûye. Ev tîgehê bêtir di nav civakê de belav bûne û naven-deke serdest li ser xwe ferz nekirine. Li gor çanda ereban ew bêtir di nav civakeke maderşahî de mezin bûne û civakeke pederşahî

dûrî wan e. Ew di “welatê” xwe de pîrsgrîrêkên xwe bêtir bi hev re li gor rêgezên êl û eşîrtiyê çareser dikin û bi salan e wisa dişî. Li welatê ku amazîgh lê dişî, ziman û çanda wan her çiqas hin ciyawaziyan bihewîne jî di dawiyê de em dibînin ku ji bo azadiya xwe li

her welatî bi şewazên cuda di hember navendên ku bindestiyê li ser wan ferz dikin yekitiya xwe ava dikin û têdikoşin. Ew ji wan navendên ku bêyî vîna wan derbarê jiyana wan de biryaran didin qet hez nakin û dixwazin ji bo jiyana xwe tenê ew xwedî biryar bin.